

ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



EREB ŞEMO

1897-1978

16
1987

NAVEROK

Jî xwendevanan	3
Derheqa benda Matveyev û pêwendiyên Kurd û Asûriyan.....	4
Lî ser çand û diroka Asûriyan.....	6
Feqiyê Teyran	9
Gotinên Pêşyan	10
Çend Çarin	11
Nefikîrma gelê Kurd	12
90 Saliya Ereb Şemo	16
Mihemed Arîf Cîzîrî çû heqîya xwe	19
Newroz bî şahî hat pîrozkirin	20
Serpêhati— Dê weledên xwe davêjin	22
Jî nav edebiyata cihanê—Xêtegêrov	24
Quncikê Zarokan	28
Komên stranên kurdi	30

Sal : 8
Hejmar : 59

XWEDÎ : KOMKAR - Swêd
BERPIRSÎYAR : Şeroyê BOTAN
NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

JÎ XWENDEVANAN

FRANSA

*Birayên Roja Nû yên berêz,
Gelek silav li we hemîyan bin.
Ez geleki dilşa me ku name-
yekî ji we re bi rê dikim ku
em nasina xwe di gel hev dey-
nin.*

*Lî welatên rojava, carna hûn
hejmarên Roja Nû diketine
destê min lê va ez ji bo ku
doktora tore û zimanê kurdi
çê bikim, derketime Fîransa.
Îca ji vir, ji bo destpêka nû ez
helbesteke xwe ji Roja Nû re
dîşinim, eger ci jê re peyda
dibe...*

*Di gel silavên welatparêzî
AMED*

EZ NAKIM

Memkên min bêne dotm
Dîranên min bêne kotm
Canê min ji hêrsa xwe nakene
Zimanê min ji bête sotm
Serê min ji sewda xwe nakeve
Ez nahêlim, ez nakim
Seriyekî kurm û kêze
Seriyekî nezani û dilêşe
Seriyekî zor û sîteme
Seriyekî tevger ne li rêze
Wekidimê
Disa ji berê bêtir
Sewda min bi hêze
Ez bernadim
Nên bernadim
Hestiya nakojim
Serê weris ez bernadim
Şopa kaniya avzê ji
Nabe ez wenda kim
Dilê kurm û kêza
Xwedê negotiye
Ez bi xwe şa kim
Serbestiyê bernadim
Hevsêr him ji nakim
Ez bernadim, ez nakim.

24.9.1985

SOVYETİSTAN

KURDISTAN

*Ax dilê min Kurdistan, can emrê min Kurdistan
Were te hemêzkim her'destan dil û can
Kurdîstana me bedew e mina qolin û kew
Geli Kurdan hûn tev rabûn bira Kurdistan netewe.*

*Ax dilê min Kurdistan, can emrê min Kurdistan
Were te hemêzkim, her'destan dil û can
Kurdîstana me hewas e,
Topa cihanê wek tas e
Geli Kurdan hûn tev rabûn, ev bîndesti êdi bese.*

*Ax dilê min Kurdistan, can emrê min Kurdistan
Were te hemêzkim, her'destan dil û can
Kurdîstana me çima weha ye
Welatê me bûye çar parçeye
Destê xelqê xerib da maye.*

*Hemidê NADIR
Y. Sovyetan*

KURDISTAN

*Roja Nû roj baş!
Ez niho li Kurdîstanê û li
Rojhilata Navin im... Şivanekî
Kurd bi xweşhatina min kir û
çûm mala wi... ji min xwest jê
re van pirtûkan bixwinim. Min
temaşê kir û min kovara Roja
Nû dit, jimara 15'an. Min jê re
xwend û wi got: "xwezi
min kurdiya nîwsinê zaniba!..."*

*Mî jê pirsî " Çawan Roja Nû
gehiştîye destê te?" Got " Ji rê
ka Cizira Botan-Zaxo-Amediyê
Dihok-Akrê-Barzan-Hac Umran
û qaçaxçî gelek in tu ji yek ji
wan i..."*

*Hevalan!
Bî vê namê re du wêneyên
zarokekî Kurd û helbestekê ji
we re dîşinim. Di xweşiyê de
bîminin û hîvidar im ku Kurd
ber bi ronahiyê yek bibin. Her
bijin.*

*Birayê we Beşir BOTANÎ
1987*

Rojhilata Navin

DAYKA SÊVÊ

*Dîhatin dengê guran û bombe-
baranê*

*Dema ku jina wê hew bû
Cihê dax û mixabinê
Çî zû, ji me çû*

*Bî aram bû, di cihên xwe de ne
gotmên wê*

*Çî b'hivî bû, çî dîlovan bû
Aman, heya roja dimahikê
Bî derd kul û jan bû*

*Serxwebûn stêra wê bû
Azadi xweşiya wê bû
Derdê welêt barê dilê wê bû
ê geş*

*Vêga ewê li aştiyê
Lî aramgeha mezin ciheki xweş
Jî xwe re ditiye*

*Ku ewê çawan bû
Ditî û gotmên wê
Dê bibine ronahi...*

B. BOTANÎ

DERHEQA BENDA MATVEYEV Û PÊWENDIYÊN KURD Û ASÛRIYAN

BARAN

Dı kowara Sowyet "Asia and Africa Today" (Asya û Afrikaya iro), hejmarra Tirmeh-Tebaxê, sala 1985 da bı serrenavê "Assyrian" bendek derket. Ev bend bı aliyê Dr. Konstantin Matveyev hatiye nivisandin. Tê da derheqa dirok û çanda gelê Asûriyan malûmatên gelek hêja hene. Me, ev bend ji İngilizi wergerande Kurdi û dı vê hejmarra Roja Nu da neşır dıkın. Her usa ji me xwest, derheqa diroka Asûriyan û pêwendiyên wan û Kurdan çend tıştan bêjin.

Ta jı diroka kewn heya iro Kurd û Asûri cinarên hev in. Mezopotamyaya jor welatê van herdu gelan bû. Kıtêbeyên ku lı Ninowa hatine ditın, gelek behsa welatê Kurdan û şerê Asûriyan û Kurdan dıkın.

Dı dema berê da hukumdarên û eşjiran gele şerê hev û du kırine. Lê diroka gelan ne tenê şer e. Ewana dı nav xwe da pêwendiyên baş ji çêkırine. Dı saya dan û standına abori, siyasi û çandi dı nav gelan da nêzikbûn, adet û usûlên wekhev û hevalti ji çêbûye. Weki pêwendiyên Kurdan û Asûriyan. Iro Asûriyên ku lı

Kurdistanê dıjin, pırani bı Kurdi dızanin û heya Kurdi bûye zmanê wan. Kılamên me, govendên me, gelek usûl û adetên me bûne yek. Dı nav Kurdan û Ermenan da ji, dı dan û standına dirêjahiya sedsalan da pêwendiyên usa baş çêbûne. Weki Aramê Tigran, bûye hozaneki Kurdan û pıreki dosti û biratiyê dı navbera gelên Kurd û Ermen da.

Jı xwe, çawa dı benda Matveyev da ji tê gotın, gelê Asûri, pışti qebûlkırına Xıristiyaniyê, lı ser reneki dini xwe rêz kır û hebûna xwe ajot. Lê pışti hılweşına dewleta Aşûr 2 hezar û 6 sed sal derbaz bûn. Dı demeke ewqas dirêj da, ma Asûri dı nav gelên cinar da qet ne heliyan, an ji bı wan ra ne keliyan? Ev yek dı benda Matveyev da baş ne hatiye lêkolandin.

Bı raya me, Asûri, xasıma pışti qebûlkırına Xıristiyaniyê, bı gelên cinar ra bı aliyê etniki gelek tevi hev bûne û keliyane.

Xıristiyanı, çawa Matveyev ji dı-bêje, 5-6 sedsal beri Mısılmaniyê lı Sûriyê, Mezopotamyê û irane belav bû. Wi çaxi, tıştêki tabiyi ye ku qısmek

ji Kurdan ji bûn Xiristiyan. Pîstre, herçiqas Mısılmaniyê dî nav Kurdan da ciyê Xiristiyanîyê girt ji, dibe ku hin ji Kurdan berxwe dan û dinê xwe ne guhartin. Çawa ku beri Xiristiyanîyê Kurd bî pîrani, belki ji bî temami Zerduşti,ango Yezidi bûn û qismek ji wan, pişti hatina Xiristiyanî û Mısılmaniyê ji, diji ewqas zulm û teda, disa ji dinê xwe yê kewn venegeriyan, ne bûn Xiristiyan û ne ji Mısılman. Iro ji lî Kurdistanê disa Kurdên yezdi hene.

Dî Dema Navçe da lî ser jiyana gelan tesira din gelek mezûn bû. Çawa ku "Suryani" lî Sûriyê û Mezopotamyê bû bû navê hemû Xiristiyanan, ne ji dûr e ku Kurd, Ereb û Asûriyên Xiristiyan ji lî dorhêla dêrê bî hev keliya bûn û ew nav standi bûn.

Ango ev Suryaniyên ku zmanê wan, çanda wan, adet û usûlên wan -ji dinê wan pêve- wek Kurdên Mısılman û Yezdi ye, ew bî eslê xwe Kurd in, an Asûriyên kewn in ku zmanê xwe ji bir kirine? Ev yek hêjayî lêkolan û lêgerinê ye.

Lê rastiyên dirokê çî dibûn bîla bîbûn (ji ber ku dî hezar salên çûyi da gelek tişt guharine), pîrs û problemên iro xwe bî awayeki dî nîşan didûn.

Tiştêki gelek eşkere ye ku, iro lî Rojhîlata Navin, gelek bî navê Asûri heye û ew wek hindikayi (minoritet) dî van welatan da diji. Vi geli ku lî dor dêra xwe kom bûye, dî sedsalên çûyi da ji hukumdar û hukumfermanên vê mîntiqê, ji hêzên zordest û kewneperest gelek zulm û zordesti ditiye û hin ji dibine. Qismek ji wan iro ji, ji ber vê zulmê û bêçaretîyê, welatê xwe, warê bav û kalan berdide û diçe.

Iro pîrsa Asûriyan lî Rojhîlata Navin, bî pîrsa şoreşên geli û demokratî va bî xurtî girêdayî ye. Xasîma bî şoreşa Kurdistanê ra. Ji ber ku gelek Asûri hin lî Kurdistanê dijin û çanda wan û Kurdan gelek nêzi hev e. Gelê Kurd ji bîndest e û nêzi du sed sal e ku bo azadî û serxwebûnê şer dike.

Bî raya me, bo gihîştina daxwazên xwe yên lî ci, divê Asûri dî şoreşa

Kurdistanê da bî xurtî ciyê xwe bîgrûn. Emê bî hevra Kurdistanek azad û demokrat ava bikûn û Asûri û gelên dî ên biçûk ji ku lî Kurdistanê wek hindikayi (minoritet) dijin, bîla ji bîndestîyê xilas bûn. Divê hertexlit zordestî ji ser din û çanda wan rabe. Xwendûn û neşriyat bî zmanê wan ji serbest be. Dî nav gelan da bî her awayî, wekhevi û birati bîla avabe.

Me Kurdan ji bîndestîyê gelek kîşandîye. Em ji rewşa gelên bîndest baş fêm dikûn û divê pişti rîzgarkirina welat ji vê yekê tucar ji bir nekûn. Welatêki azad û demokrat hêja ye ku meriv lê bîji. Mîletêki ku bî her awayî demokratî pêk aniye, zulm û zordestî rakirîye, ev mîletêki mezûn û xurt e.

Asûri ji birayên me ne û şerê me bo azadîyê yek e.

Ev benda ku lî ser dirok û çanda gelê Asûri dî kowara "Asya û Afrikaya Iro" da derketîye, gelek lî ci ye û baş e. Bo wê ye ku em ji wê bî zmanê xwe neşir dikûn.

Lê tiştêki bala me kîşand. Em çend sal e ku vê kowara hêja dixwinûn, tê da lî ser tevgera gele mîletan û hindikayiyan -çî biçûk çî mezûn- tê nivîsandûn, lê pîr mîxabin, em rasti behsa Kurdan wek "mîletêki" û behsa tevgera rîzgarixwazi ya Kurdistanê ne hatûn.. Tu dibê bo çî ye? Em Kurd ji ne hindik in û heya ne "hindikayi" ne. Em ji 25 milyoni zêtir in û ji 20 milyoni zêtir lî ser welatê xwe yê parçebûyi, lî Kurdistanê ne. Serhîldanên Kurdan ji sedsalan vîr da ajot û hat. Iro lî Kurdistanê Iraq û Iranê 30-40 hezar pêşmerge şerê partizani bî xurtî rêva dibe. Zulma ser Kurdan zulmeke giran e, Kurdistan seranser dikele, bî destê zordestan tê hîlweşandûn û şewitandûn. Nîzam nivîskarên Asya û Afrikaya Iro lî ser vê yekê çîma usa bîdeng in?. Em dixwazûn û hevi dikûn ku ew bîdengi êdî bîghê dawî û dengê dostan bîlînd be ji bo mîletê me yê cefakêş ji.

Ji ber ku, serketîna şoreşa Kurdistanê ne tenê ji vî mîletê mezûn û kewn ra, ji çend gelên biçûk ra ji ronahiya azadîyê wê bine ku dilê camêran pê dişewite.

Li ser

dirok û çanda asûriyan(*)

KONSTANTIN MATVEYEV Dr (felsefe)

Asûri yek ji gelênheri kevn in li dinê. Di salên 1970 da hejmara wan ji milyoneki zêtir bû. Pîraniya wan li welatên Rojhilata Navin -li Iraqê, Îranê, Tirkîyê, Sûriyê, Lîbnanê, Mîsrê, Urdunê, Kuweytê û Îsrailê dijîn. Hin cîmaetên wan ên biçûk ji li Swedê, Britanyê, Fransê, Elmaniya Rojava, Yewnanistanê û Australya tene ditin. Dora 25,000 hezar Asûri li Yekîtiya Sowyet dijîn.

Welatê Asûriyan yê diroki bakûrê Iraq e ku Yewnaniyên kewn jê ra digotin Assyria. Asûri bî xwe, ji xwe ra dibêjin Aşûr. Dewleta Aşûr qasî du hezar sal dom kirî bû.

Împaratoriya Aşûr, di dema xwe yê xurt da sinorên xwe ji Iraqê heya Mîsrê dirêj dibû. Ew, piştê, ji ber êrişên der û dubendiyên hundur sist ketî bû û li pêş êrişeke xurt ya Medan û Babilonyan bî hevra, di sala 605 da Beri Êsa ji hev ket. Lê gelê Asûri ji wê vîrda ji kari çanda xwe yê netewî, adetên xwe û nişanên xwe yê etnikî biparêze.

Asûriyan nêzî du hezar salî di nav sinorên dewletê da bî aliyê etnikî bî hevra keliya bûn. Wê dema dirêj tesîreke baş li ser wan kir ku, karin wek gelekî jiyana xwe bîdomîn.

Di dema sazûmana koletiyê da milletê Asûri ji du beşên bîngêhin pêk dihat: Asûri û Arami. Ev herdu, piştê li hev keliyan û gelekî nu pêk anin bî rengê çanda Asûri ku gelek kewn û xurt bû. Dema ku împaratoriya ji hev ket, cîmaeta Asûriyan bî hejmar gîha bû milyonan û di nav da hebûna qat û sînfan gelek xuyayî bû. Ev cîmaet bî aliyê erda ku lê rûdinişt, bî adetên xwe, bî zmanê xwe -ku wê demê li cîyekî gelek

fîreh dihatê qîsekîrîn- bî hişyariya hebûna xwe ya etnikî û bî sistbûna rol û tesîra pêwendiyên merivatiyê (malbatî, eşîrtî) -ku li pîr cîyan bî temami wînda bû bû- ji gelên din dihatê cudakîrîn. Ji ber vê yekê ye ku, piştî hilweşîna dewleta Aşûr ji, Asûri wînda ne bûn û di nav gelên serketî da ne heliyan.

Wê şunda diroka Asûriyan bî qêdera împaratoriya Roman, piştê bî ya Bizansîyan, Akamenîdyan, Partan, Sasaniyên Îran, Xelîfetiya Ereban û împaratoriya Osmanîyan ra bî xurtî girêdayî ye. Asûriyan di bin hukmavanan dewletan da wek cîmaetek biçûk (hindîkayî) cî girtin. Her usa ji, wek cîmaetêke bîndest hatin zêrandin û zulm û qîrkîrîn ditin. Bona vê yekê, gelek caran li rê û olaxên serhîldanê gerîyan. Li sed sala yekemîn Piştî Êsa, Xîrîstîyani dest pê kir ber bî Sûriyê, Mezopotamyê û Îran belav bû û Asûri yê herî pêşîn bûn ku ew qebûl kirin.

Tîştêki gelek xuyayî ye ku di pêkhatina Asûriyan da wek gelekî hindîkayî (minorîtet), ji dewletê zêtir rêxistinên dinî, dêra fillan roleke mezîn listîne. Ew ku ji dewletê û ji serokatîyek dînyevî bêpar bûn, di saya dêrê û keşişan da yekîtiya xwe pêk anin. Diroka dînyevî ya vî milleti, ji wê rojê heya îro, bî diroka dêra Asûriyan va bî xurtî girêdayî ye. Gora hal û şertên wê demê, Xîrîstîyaniyê tesîreke baş kir di xurtbûna yekîtiya Asûriyan da wek gelekî.

Xîrîstîyani di sed sala 4'an da bû dinê resmî di împaratoriya Bisansê da. Welatê Asûriyan ji di nav sinorê wê dewletê da dima. Lê di sa ji zordestiya netewî, cîwaki û aborî li ser




Fig.1.




Fig.2.

Fig.1. Arma Asûriyan (urigalu)

Fig.2. Heykelê boxeki li ber dergeyê seraya Asûrnasirpal, li Kelehê

Asûriyan sist ne bû. Bona vê yekê, diji dêra Ortodoks a Bizansê, dî bin çend şikl û navan da çend caran rabûn: Wek serikişandina Nestorian (dî sedsala 5'an da), Monofiziti (Yakobîti, dî sedsala 6'an da) û Maronîti (dî sedsala 7'an da). Dî sedsala 16 da Asûriyan dêra Asûri-Geldani saz kirin ku bî dêra Romani Katolik ra yekîti çêkir. Piştîre dêra Katolik jî saz kirin.

Jî ber van tevgerên cûdabûnên dini, bir û baweriyên Asûriyan dî derheqê hebûna wani geli da, her ku çû, bî rengeki dini xwe nişan da û wan, xwe bî xwe, gora cîmaeta xwe ya dini bî nav kirin. Wek: Nestori, Yakobi, Maroni, Geldani, Katolik, Suryani. Gelên dîn jî wexta behsa Asûriyan dikin, van navan bî kar tinin.

Diyalekteki zmanê Asûri ku li Sûriyê gelekî fireh tê qisekirin, bo propagandeya Xîristiyanîyê hatî bû karanin. Bona vê yekê, herçî ku dinê xwe guhart û bû xîristiyan, jê ra digotin Suryani. Asûriyên Iraqê

hin jî vi navi (Suryan-Suraya) bî kar tinin wek navê hemû Xîristiyanan.

Asûriyên roja iro xudan mirata dirok û çanda kewn in. Kitêbxanevaniya herî pêşin, bî dezgeyê zanîstî û kitêbxaneyê geli ya herî pêşin li Asûriyê xwe nişan da û bî destê hukmdar Asûrbanipal hate saz kirin. Ev kitêbxane dî payitextê Aşûr da bû û tê da bî hezaran kitêbeyên kilê ci digirt. Asûriyan dî wan da nav û nişanên hukmdarên xwe û bûyerên diroki dî derheqê Asûriyan û ciranên wan da hûr û hûr nivisandî bûn. Mîxnivîsa Asûriyan usûl û dezgeyê nivisandinê yê herî pêşin bû ku bî destê insanan hatî bû kîvşkirin. Asûriyan ansiklopedî, ferhengên zmanê Asûri û Sumer û kitêbên ku jî bendên xwendinê pêk dihatin çêkirî bûn. Felsefa vi milleti dî gelek efrandinên edebî û çirokzani (mitolojîk) da xwe nişan dîda. Dî dema xwe ya xurt da împatoriya Asûriyan gelek gel û welatên dîn xîstî bû nav sinorên xwe. Bona qontrola împatoriyeke ewqas fireh

diviya bû leşkerekî gelek gıran hebe û gele şop û nişanên dest ketine eşkere dîkîn ku ew xudanê ordiyeke xurt bi 400,000 leşkerekî bû. Dî vê ordiyê da peya, suwari, erebên şer û lekên mihendizan gelek bi firehi bi kar dihat. Her usa ji, têlgırafê êgır (agir vêxistin li ser rêyên hukumdar) li vi welatî gelek bi firehi dihatê şuxulandin. Vê têlgırafê rê dîda ku xeberên derheqa xeterê, êrişên dijmin û derd û belayên din zû biğhê Ninowayê. Dıgel vê, bo gıhandina xeberan li ser rêyan postexane hatî bûn avakirin û li wir tim hesp, rêvingî û erebe hazır bûn bo gıhandina gonaxeke din.

Dî ali karen xweşiyê (tîbbê) da Asûri gelek bi pêşva çû bûn. Doxtorên Asûriyan dikarî bûn perdên ser çavan û gılmikan (tûmor) hılîn, hestiyên şikestî bi hev bîkelîn û hestiyê seri bi bîrekê vekin. Marê ku xwe bi şivê badaye nişana tîbbê bû li Asûryê. Dî dema Navçe da Asûriyan roleke mezî listî dî belavkirina Xıristiyanîyê û çandê li navçeyê Asyê, Mezopotamyê, Çinê û Hindistanê. Ewana bi vi awayî dî navbera Rojhilatê û Ewrûpê da pêwendî çêkirin. Dî Dema Navçe da gelek nivîskar, hozan, dinzan (teolog), fîlozof, fizikzan û matematikzanên bi nav û deng derketin ji Asûriyan.

Asûriyan gele caran seri hıldane û şer kirine bo azadî û serxwebûnê. Dî zemanê nêzik -xasîma dî salên 1914-1918- da, Asûri dîji împaratoriya Osmanî çend caran bi awayekî gelî rabûn, ku bû bedêla jiyana nivîlyonî zêtir Asûriyan.

Şoreşa Sosyaliştî ya Oktobra Mezî tesîreke xurt kir li ser tevgera rızgarixwazî ya Asûri û fikrê tekoşinê bo heqê rastkirina rîya xwe û bo serxwebûn û hukum xîste nav.

Serketîna Yekîtîya Sovyêt dî şerê welatparêzî yê Mezî da, disa tesîreke mezî kir li ser tevgerên rızgarixwaz ên netewî ku tevgera Asûriyan jî para xwe jê girt. Dî sala 1945'an da Asûriyan alîkariya Azîrbaycanî û Kurdên Îranê kirin bo destxistin

otonomî. Asûriyan dî vê tevgerê da ci girtin û bo xwe jî heqên çandî, ango xwendin û çapkırîna kîtêban, rojnameyan û kowaran bi zmanê Asûri xwestin. Dî tevgera rızgarixwazî ya Asûriyan da, piştî şer, bi awayekî eşkere tê ditin ku, wan bi gelên Rojhilatê Navîn yekîtîyek xurt pêk anîye bo tekoşîna azadî û rızgarîyê.

Diroka Asûriyan a bi zor û zehmet xweş nişan dîde ku rewşa vi milleti, bîndestbûn û belavbûna wî dî sistema kapitalîstî ya dinyayê da, jî rûbarî dek û dolavên împeryalistên talanker pêk tê. Ev milletê ku bi dirok û çandê usa kewn û dewlemend, dî waxt û zeman da guhartîye û iro bûye gelekî ku li Rojhilatê Navîn bi aliyê tu kesî "nayê xwestin", ew dê tim bîminê wek rûreşîyeke mezî dî diroka hêzên şovîn ên van welatan û dî diroka kolonyalist û nekolonyalistan da.

Rewşa Asûriyên ku iro dî Yekîtîya Sovyêt da dijîn, misaleke baş e dî safikirina pîrsa milletiye da. Wek hemû grûbên etnik li Yekîtîya Sovyêt, Asûri jî dî warê cıwaki, aborî, siyasî û ruhî da bi lez pêşva dîçîn. Ew gelek serfıraz û serbîlînd in ku tevî temamiya gelên Sowyêt gıhane dereceki bîlînd. Dî nav Asûriyan da nûnerên gel, kadrên dewlet û Partiyê, mesûlên sendikayan û komsomol hene. Dî dema rojên tariyên Şerê Welatparêzî yê Mezî da Asûriyan, tevî gelên din ên Welatê Sovyêt, dijî Elmaniya faşî şer kirin. Gora hejmartîneke berî Şerê 2. li Yekîtîya Sovyêt 20 hezar Asûri hebû û jî wan 2 hezar kes dî şer da ci girt. Du kes jî wan, bi mîrxwasiya Yekîtîya Sovyêt hat nişankirin.

Li Yekîtîya Sovyêt dî saya Partiya Komûnîst a Yekîtîya Sovyêt, Asûri jî wek hemû grûbên etnik -çî mezî çî bîçûk- bi şikleki wekhevi jî hemû heq û azadiyan pardar in û serfıraz in.

(*) Ev bend jî kowara Sowyêt a mehi "Asia and Africa Today", jî çapa îngilîzî hate wergerandin.



Ji Nav Edebiyata Kurdî ya Klasîkî

FEQIYE TEYRAN

(1590 - 1660)

Dî nav hozanên kurdi yê nêvî da, yê nêvî ku li Kurdistanê baş tîn naskirin, yek ji wan jî Feqiyê Teyran e. Bî ihtimaleke mezî xelkê bî xwe ev nav li wî kirîye. Navê wî yê rastî Mihemed e. Ew jî dorhêla Hekariya (Çolemerg) jî qeseba Muqsê ye.

Jî sedsalan vîrda ew bî laqabê "Feqiyê Teyran", li ser zar û zîmanê gelê me geriyaye, jî nîvşan derbasî nîvşan bûye. Gelê kurd ew jî xwe ra gelekî nêzik ditiye û jê hezkirîye. Jî ber ku helbest, beyt û xweşxanên wî bî kurmancîyeke vekirî û gelek caran li ser jiyana xelkê hatme gotin. Ew bî xurtî li dijî zulm û kedxwariya mir û derebegan derdikeve. Feqiyê Teyran bî sedsalan beri niha bî çaveki materiyalist li jîyanê û li paşeroja mirovatîyê nihêriye. Û wî hin jî wê çaxê ditiye ku paşeroja mirovatîyê ronahî ye, bivê nevê dawîya zulmê wê rojekê bê. Dî rîstên xwe da, wî ev bawerîya han weha anîye zîman:

Jî niha ve bêje, bî bawerî, jî der û dor
Rojek dê azadî bê rûyê dinê.

.....
Ê derbazbî rojên xefûr
Ê bîn rojên qenc ên kîbîr
Xwe re bîkî ra û tevdir
Hêsir nebî ber zulma mir.

Dî navbera berhemên Feqiyê Teyran û zargotîna (edebiyata anonim) kurdi da pêwendîyê xurt hene, wî gelek caran nîmûneyên edebiyata anonim jî efrandîmên xwe ra kirîye bîngêh. Herweha gelek beyt û xweşxanên wî jî ketîne nav zargotîna me. Hin helbestên wî bûne stran û dî nav xelkê da hatme gotin.

Helbestên Feqiyê Teyran, bî şewayê nivîsandîna xwe, bî wezn û naveroka xwe nêzîkî edebiyata xelkê ne. Jî ber vê yekê jî gelek helbest û stranên ku dî nav xelkê da tîn gotin li ser navê Feqiyê Teyran tîn hesabkirin. Heta niha tenê li Sovyetîstanê, dî nav Kurdên Ermenîstanê da gelek helbest û stran hatme berhevkirin û bûne kitêb û li ser navê Feqiyê Teyran hatme çapkirin. (Bnr. Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Cild 1, rûp. 72)

Wek nîmûne em li jêrê helbestek Feqiyê Teyran û şaxê wê yê folklorî bîdî ber hev:

Feqiyê Teyran

*Ruhniya fîndê gîhîştê
Horiya bukra bîhîştê
Dî li ser banê kîhîştê
Dî ko keç ban dîkîtê
Dî neva xelwete ew dîn dîbû
Tîjî dîmaxe xûn dîbû
Şehba sîpi rengin dîbû
Ew hal û reng qet jê ne tê
Ehlê terîq, ehlê sîlûk
Her çî mezî, her çî bîçûk
Axa û xewace û milûk
Pîrsîne li Şêx zehmetê.*

Strana Xelkê

*Ronaya fîndê gîhîştê
Horia bîkûra bîhoştê
Şêx dî ser banê kîhîştê
Şêx batnî bang bîkîtê
Şêx xewnê da dîn dîbû*

Tji dimaxa xûn dibû
Sêva sîpi rengin dibû
Ax dûre roja wi bê
Ehlê teriz ehlê milûk
Hindi mezin çendi çûk
Xocê û axa û milûk
Hemû Şêx dîkin pîrsiyarê.

(Dr. M.B.Rûdenko, F.Teyran, Şêx Sen'an,
rûp. 15)

BERHEMÊN FEQİYÊ TEYRAN

Efrandinên Feqiyê Teyran, yên ku iro tén zanin evin: "Şêx Sen'an", "Qewlê Hespê Reş" û "Ber Sis". Bili van hin helbestên din û name-yên wi ji Melayê Ciziri ra hene. Lêger û edebiyatnas li ser hemfikir in ku ev eserên han yên Feqiyê Teyran in. Lê ev hozanê Edebiyata Kurdi ya kevn, iro ji babetê lêgerin û lêkolînê ye. Ew ji hemû aliyan va baş derneketiye ronahiyê.

Şêx Sen'an (Şêxê Sedenya), di folklorê kurdi da wek destana "Dota Gurca" tê naskirin û gotin. Feqiyê Teyran, ew çirok-destana han ku ji berêda di nav gelê kurd û gelên ciran da dihat gotin, bi rengê bedewî, bi qayde, form û kêş û qafiya edebî hûnandiye û navê "Şêx Sen'an" lêkiriye.

Feqiyê Teyran, ev di sala 1030 (hicri) da nivisiye. Ji 313 komrêzan pêktê, komrêz çar, hin ji 3 mîsra ne. Di efrandinê xwe da, Feqiyê Teyran weznê Hezac bi kar tîne, ku ev weznê nêzîki weznê zargotina kurdi "4 + 4" e.

Şêx Sen'an cara pêşin sala 1965'an li Moskovayê hat çapkirin. Ew bi destê Dr. Margarita Barisnova Rûdenko hatiye amadekirin û bi lîstîkê hêrin û serdariya Prof. Qanatê Kurdo hatiye çapkirin. Her ew çap di sala 1986'an da, bi wergera tipên latîni, ku ji aliyê Memo Yetkin hatiye amadekirin, di nav Weşanên Roja Nû da derketiye. □

gotinên pêşiyar

Berevkar : SÛPAN

Xweyi kîr bi malê xwe, agir berda canê xwe.

Bila pariye meriv nîvî be lê namûsa meriv li
ci be

Bila dilê meriv rihet be, xurê meriv xweli be

Jin heye jînkok heye

Mîrov di roja teng da ji yarê diya xwe ra dibê
xalo.

Ya mêran lêhatîne jê hatbûn nine.

Tunebûn mêrê çê dîke bînya rê.

Kew li darê ket dar li kewê neket.

Dayika mîrov her tim nawelîde û lawa nayne.

Jina ser mezîna pê biçûk, xwezi li wê malê bi-
be bûk.

Mêrê bê kêr du caran şer dixwaze.

Pîrê bawer ne bû ku mêr bike, mêr kîr dewa
mal û mîlk dîke.

Dewê mîrov ê ceribandî ji mastê xelkê ne ceri-
bandî çêtîre.

Ji tîralan wetrê tavehîv sibeye.

Bila dilê mîrov bi dil be, tûrê parsê li mîl be,
xwarîna mîrov gîlgîl be.

Law radîbe darê bavê dîgre, qîz radîbe teşîya
dê dîgre.

Mîrov bi lîngan şîqîti xwe dîgre, lê bi zîman şî-
qîti xwe nagre.

Destê tîr li ser zîkê birçîye.

Zarên hûr çerezên malê ne.

Çavê li derîya xweli li seriya.

Kerên guh sist tîrê şîdyayî dîkin.

Garan berbî mal bû, bûka malê nû şuxulkar bû.

Kor korên Xwedê ne niv kor bela dinê ne.

Mîn ji vi ewri ne bawere ku baran jê bîbare.

çend çarin

BARAN

Çemê deştê za bû lı bin tava havinê
Çemê bin erdê bédeng çû gıhâ ummanê
Bı halana nav û dengeki seravê xwe mexapın
Kûr bıçe, navê xwe lı kevir û hesın binexşine

* * *

Yeki kor çawa dıkare lı hev bine rengan
Yeki kehr çawa dızane qedr û qimeta dengan
Hosteki bıbin jı xwe ra , hunerê hin be
Beri ku lı vi baxçeyi bibi baxçevan

* * *

Te cot kır lı ciyeki şorax û bê din
Zadê bejn ne da û bê ber ma fêkiyin
Hêviya xwe wında meke, cotkaro!
Erdê tevde, paqışke, bıguhurin

* * *

Bı lédana çakûç hezaran çik dirêşın
Hedad şevê dihelinın, rojê dirêşın
Hedadi ne gora bihtengan e, hevalo!
Beri xwe polake, hin dest bavêje hêsın

* * *

Ger dilê te geş be ev dinya wek gulistan e
Bı birin be, pin û pag e, wek goristan e
Mın jê hezkır tım, çı dı cejnán, çı dı şeran da
Dinya xweş e, delal e, lê ne wek Kurdistan e

* * *

Berfa teze jı mın ra xem û xeyal anin
Jı zarotiya mın çirok û xezal anin
Jiyan tevneke rengin e, her çêkır
Û bı dû xwe ev pênci sal anin

* * *

Zaroti bı çavên zelal wek kaniyan e
Cıwani bı kar û evin wek pilingan e
Çı heyşdeh sali bi, çı heyştê sali
Jiyan wek sêvek sor e, dıl cıwan e

Dewleta Kolonyalist û Faşî Dîxwaze Xwe Bî
Carekê Jî Pîrsgirêka Gelê Kurd Xilas Bîke.

DÎSAN NEFÎ!



Diroka Kurdistanê gelek caran nişan daye ku, gava tevgera azadi geş bûye û şax daye, dijmin hanhanka bî hemû cûre yên barbariyê êrişî gel û azadixwazan kîriye. Lewra dijmin gelê me baş nas dîke û baş pê dîzane, ku gelê me çiqas rûmetê dîde azadiyê, serxwebûnê. Dewleta kolonyalist û faşî jî bo fetîsandîna tevgeran, helandin û jî hev belavkirina gelê me, talan û kambax kirina Kurdistanê hemû rêyan dîceribîne û ev hovîti jî 12'ê Îlonê vir da gihîştîye sinorê jenosîdê.

Hukmê faşî jî alîki va hazîriya zeftkirina Kurdistanê Iraqê dîke û êrişan dibe ser, ku jî 12'ê Îlonê vir da sê caran êriş kir; cara dawî di 4'ê Adarê da tevi 30 balafirên bombaranê êrişî Kurdistanê Iraq kir û bî sedan jin, zarok, zîlam hate qetîl kirin.

Cunta faşî, her carê bî maneyek klasik jî êrişê xwe ra ci çê dîke, propaganda şovenî lî dara dîxe û radyo, televizyon, rojname û berdevkên burjuvaziyê seferber dîke. Van kiryarên hovî bî xapên "terorîst", "eşqîya", "welat jî dest çû", "Kerkûk yê Tîrkan e" û wd. pêk tîn.

Wek tê zanin, ji berê va dewleta kolonyalist çav berdaye Kerkûk û Mûsilê û di her fersendi da vi daxwaza xwe yê dagrker eşkere dike. Eger iro ev daxwaz gihiştî be merhela êrişê, çend sedemên wi hene: Sedemê sereke, bê şik pîrsgrêka gelê kurd e; ku di Kurdistanê Iraq û Îranê da şerê partizani dajo û bî taybeti ji di Kurdistanê Iraqê da navçeyên rîzgar kîri roj bî roj firehtir dibe, şer digihije merheleyek wisa ku dijmin dikeve naçariyek mezin; û bûyera gring ji, di navbera hêzên Kurdistanê Iraqê da ava bûna yekitiyê ye. Sedemek dîm, petrola kerkûkê û "daxwazên diroki" yê dewleta kolonyalist ya Tirk e. Pîrsgrêka şerê Îranê û Iraqê û planên Emrika yê ser Rojhilata Navin ji sedemek dîm e. Lî piştê êrişên Tirkîyê kîşkirina Emrika û dewletên emperyalist heye. Hetta Emrika û NATO eşkere piştgiriya êrişên cunta faşî dike û ji bo zêft kirina Kerkûk û Mûsilê Tirkîyê kîş dike.

Dewleta Kolonyali û Faşî Dîxwaze Xwe Bî Carekê Jî Pîrsgrêka Gelê Kurd Xilas Bîke

Cunta faşî lî dû planek bî qîlêr yê mezime. Jî 12'ê Îlonê vîr da bî gelek mane yê vala wek "bî dest xîstina mehkûm û fîraran, silahan, terorîstan û hwd..." lî Kurdistanê operasyon, girtin, êşkence û kuştin, mehkem kirina sinor û vala kirina gundên sinor, zêft kirina erdan, tevîzandina jiyana aborî, guhaztina havê gund û insanan û wd. şerek ne êlan kîri dom dike û van hovîtiyan parçeyên vê planê ne.

Sazûmana kolonyalist, jî bo helandina gelê Kurd tu dek û dolav nema ku, ceriband. Lê bî vê awayê jî bî ser ne ket. Êdî ew jî baş dîzane û dîbine, ku wê nîkarî be xwe jî vê pîrsgrêkê xilas bîke. Lewra jî bo "çare lêkirina" vê meselê, divê 25 milyon Kurd jî holê bê rakirin (!) ku dewleta kolonyalist bîkarîbe bigihê armanca xwe. Eşkere ye ku wê daxwaza wan di qirika wan da bîmine û wê nîkarî bîm vê armanca xwe pêk bînin.

Rejîma barbar lî qîrkirina gelê me digere. Jî sîsêya du (3/2) yê ordiyê, pîraniya hêzên polêsan, hêzên qomando û "timên taybetî" lî Kurdistanê bî cî kîriye. "Parêzkarên gund" yê ku jî gel pêk hatiye serbarî ser. Vana jîyanê lî gelê me kîrîne zîndan. Dî van salên dawî da lî Kurdistanê gelek bîngêhên (uss) Emrika û NATO, balafîrgehên eskerî hatin ava kirin; yê kevî hatin fireh kirin. Jî ber vê yekê bî sedan gundên Kurdistanê hatin vala kirin. Bî sedan gund jî jî ber avayiyên bendên ser Dicle û Ferat hatin va-

la kirin. Jî ber zulm û terorê gelek gundên sinor û navçên dîm koçemal bûn. Rejîma faşî bî vana jî qîma xwe nayne, nîha, bînavê "parastina darîstanan" hazîriya menfî kîrînek nedîti dike. Dîxwaze 12 milyon Kurd, ku di Kurdistanê Tirkîyê da dijîn, bî carek menfî bîke, berê wan bîde Rojavayê Tirkîyê û xwe bî carek jî vê pîrsgrêkê xilas bîke (!).

Bê şik ev plan planek qîr kîrîne ye û heta nîha di Kurdistanê da jî vê nefîkirîne mezîntîr û firehtîr pêk ne hatiye. Mîrov dikare bêje, ku di-roka insaniyetê, heta nîha, jî barbarîyek weha ra şahîd ne bûye.



Plana nefîkirîne ne tenê jî bo çend mîntîqan e. Her çîqas wek nefîkirîna 487 gundên Dersim û Ezîrcanê bê xuya kirin jî, di eslê xwe da pîraniya Kurdistanê di plana koç kîrîne da ye. Lî gor hejmara fermî, ku hukumeta Ozal yê xwefîroş eşkere kîr, 9,5 milyon di plana menfî kîrîne da ye. Lê em baş dîzanî ku jî vê hejmarê jî zêdetîr e.

Bî Kurtayî Dîroka Nefîkirînên Kurdistanê

Dewleta kolonyalist ya Tirk, ne nîha, jî berê va jî bo tevîzandîna asimîlekîrîna gelê Kurd armanca xwa ya bî qîlêr bî demagojîyan û bî hîmek qanûnan perde kîriye, sîyaseta xwe ya şoven lî ser bîngêha înkâr kirina gelê Kurd saz kîriye. Jî van qanûnên sereke yek jê jî qanûna "Mecbûrî Îskan" e. Gerçî menfî kîrînên gelê Kurd berya komara Tirkîyê jî (dema Osmanîyan) hebû û gelek caran hatiye pêkanîn. Ku di

Şerê Cihanê yê Yekem da Celadet Eli Bedirxan dî ordiya Osmaniyan da sûbay büye û derheqa bûyerên " menfi kırımê " da weha dibêje:

"Dî dema agirbirinê (mutareke) da gava ez gîham Stenbole, mî lîkolinek lî ser ewraqên Daira Macira kîr û lî gor raçavkırma mî jî Kurdistanê 650.000 nufûs berbî Rojavayê Enedolê hatî bû sewq kırım. Wextê ez çûm cephe dî buhurên çiyayê Toros da mî çend qefle yê marîyan dît. Van qefleyan jî dîr va wek komên mirovan dihatî xuya kırım, lê gava nêzi koman bûm, mî dît ku vana jî heykelên insanan, ku jî serma û seqemê hışk bû bûn û bû bûn wek kevir, pêştir tîştêk nî bûn. Pîraniya van mirovên ku jî welatê xwe hatî bûn dîr xîstî, dî rêyan da jî nexweşî, birçibûn û sermayê qır bû bûn.

na gelê me bû siyaseta fermî; gelê Kurd wek "Türkên çiyayî" hatî nişandan û dî vî wari da gelek çirok hatî nivîsandî û propaganda kırım. Bî vana jî qîma xwe ne anî, dî sala 1934'an da qanûna "mecbûri iskan"ê derxîstî. Qanûna menfi kırımê bî taybetî jî bo helandîna gelê me hatî bû çê kırım.

Ev qanûn, jî alî menfi kırımê (iskanê) va, Tîrkiyê wek sê navçeyan parvedike û dî benda 2. an da weha tê xuya kırım:

"Mıntıqeyên Yekemî: Ciyên ku wê nufûsa jî kultura Tîrk bê dagirtî.

"Mıntıqeyên Duemî: Ciyên jî bo neql kırım û menfi kırma nufûsa ku wê dî nava kultura Tîrk da bê helandî.

"Mıntıqeyên Sêemî: Ciyên ku jî ber sedemên cî, sıhet, aborî, çand, sıyaset, eskerî û



Dî sala 1919'an da dî dema gera mî ya Kurdistanê, ez rasti qefleyek jî wan qefleyan hatîm. Wana dîzvîrî welatê xwe. Lî gor agahdariyên ku mî jî wan stend, gava wan jî welatê wan dîr xîstîne 485 kes bûne; dî vegeerê da tenê 255 kes mabûn. (Kemal Burkay, Kürdistan'ın Sömürgeleştirilmesi ve Kürt Ulusal Hareketleri, rûp. 74)

Ev tenê minakeke jî zalîmiya dewleta xwinîjî û minakên weha gelek cara hatiye tekrar kırım.

Pîştî saz kırma Komara Tîrkiyê, hukumeta Kemalîst yê şoven û zalîm dest bî înkâr kırma Kurdistanê û gelê Kurd kîr. Daxwaz û serhildanên netewî bî xwinê hate fetîsandî; înkâr kırım

zabîti têne vala kırım û jî rûniştandî û bî cî bûnê ra hatîne qedexê kırım. (İsmail Beşikçi, Kürtlerin Mecbûri İskanı, rûp. 133, weşanên Komal)

Mıntıqên ewil Kurdistan e û qest ew e ku lî Kurdistanê nufûsa Tîrk bê dagirtî û gelê Kurd bê asimile kırım.

Mıntıqên duemîn Akdeniz, Marmara, Ege û Trakya ye, ku wê Kurdên menfi kırımê lî wan dera bêne bî cî kırım.

Mıntıqên sêemîn Agırî, Sason, Dersim, Zeylan (Wan), Başûrê Qersê, çend hêlên Diyarbekır, Bedlis, Bingol û çend hêlên Mûşê ne, ku van mintıqan wê bê vala kırım û jî rûniştandîne ra bêne qedexê kırım.

"Bend 9 : Koçerên ku ne girêdayi kultura Tirk in, wê bî awaki belawela -ne bî komiti- lî qesebe û gundên tirkan bêne belavkîrî û dî wî wari da Wezirê Daxilî xwedi selahiyet e.

" Bend 10/ Ç : Wezirê Daxilî xwedi selahiyet e ku yê nê ji qewmê tirk bîn, eşîretên ku ne girêdayi kultura tirk bîn, mirovên wan lî muntiqên duemin ji hev dûr bî ci bike..... eger pêwîst bike Wezirê Daxilî xwedi selahiyet e ku eşîretên koçer yê nê ne girêdayi kultura tirk e, derxe dervayî Tirkîyê.

" Bend 11/ A : Yê nê ku zîmanê wan yê zîkmakî ne tirkî be, ji wan ra qedexe ye, ku ji nû va gund û şar, damezrandîna komên karker û sinetkar, ji qewmîyên xwe ra gundekî, şarekî, karekî yan ji sinetekî, peyda bikin.

C : Hejmara biyanîyên ku dî bajar û qeseban da bî ci bûne ji % 10'ê nufûsa sinorên beledîyê nîkare derbas bike. Û nîkarîna şarekî cîhê saz bikin.

Bend 13/ 3 : Kesên ku ne ji nijada Tirk in, wê lî bajar û qeseban wîsa bêne belavkîrî ku gund, şar yan ji kom peyda nebe. " (Îsmail Beşikçi, Kürtlerin Mecburi İskanı, rûp.138, 142, 146 - Weşanên Komal)

Jî van bendên jor, ku me ji qanûna "mecbûrî İskanê" girt, armanca dewleta kolonyalist vekirî û eşkere ye ku dixwazîna gelê kurd ji Kurdistanê dûr bikin; lî Rojavayê Tirkîyê belav bikin û jî bo asimîle kirîna wan bîcadînin. Kurd lî muntiqên duem (Akdeniz, Marmara, Ege, Trakya) wîsa têne belavkîrî ku lî tu cîkî nîkarîbîna kom, gund, şar yan ji komek pêk bin û bîbîna pîrsîgrêk. Disa wîsa têne belavkîrî ku lî tu cîkî ji hejmara % 10 derbas ne bîn. Ev rewş baş dîde xuya kirîna, ku dewleta kolonyalist çîqas lî hember vê pîrsîgrêka gelê me dîtîrse û çîqas lî hember vê meselê hesas e.

Nefîkîrîna Gelê Kurd Bî Derew û Xapan Tê Perde kirîna

Wek me lî jor ji got, cunta faşî dî bîna navê "parastîna darîstanê" da dixwazîna plana qîr kirîna ya gelê kurd pêk bine. Kijan parastîna? bî van vîr û xapan zarok ji nayên xapandîna. Lewra yê nê

ku lî Kurdistanê darîstanan bîşewîtîne, wê çawa bibe parêzkarê dar û darîstanan?

Xapek dîna ji weha ye: Goya "gundên menfî kirînê jî hev belawela ne û bîçûk in, jî ber vê yekê jî van derdorîna ra xîzmet bîrîna gelek zor û bîhaye...Dewlet wê wan lî erdên çandîniyê bî ci bike, erd bîde wan!".. Kijan erd? Eşkere ye ku lî pişt vê xapê perîşanî, bîrçîbûn, betalî û plana asimîle kirîna ya gelê me heye. İca jî kengê va kedxwar û xwînmîj jî me ra bûne dost?

Ew rejîma kolonyalist ku heta iro lî Kurdistanê û Tirkîyê xwe nêzî reforma erd nekîrîye, wê çawa lî Rojavayê Tirkîyê erd bîde gelê me? Dîkeve aqlan ku erdê cotkar û gundîyên Tirk lî Kurdên koçemal bê parvekîrîna û cotkar û gundîyên tirk vîya qebûl bikin? Bî rasti kenê dîna bî van derew û xapan tê.

Belkî lî hîm hêlên Kurdistanê, jî ber zulm û barbarîya cunta faşî û tehdîdên menfî kirînê hînek mirovên me bîxwazîna (!) jî erdê bav û kalan bar bikin û bî derewên dijîna bawer bikin! Bê guman xuyaye, ku wê bê mal û war, bîrçî, tazi û ruswa bîbîna. Jî bo fêma kirîna ya plana hukûmeta Ozalê xwefîroş, pêwîst nîne ku mirov xwedi keramet be.

Dewleta kolonyalist ya Tirk heta iro tucara başî û rîheta gelê me ne fîkîrîye û nafîkîrîye jî. Tîm bî çavê talanê lî Kurdistanê mêze kirîye û tîm çav berdaye keda gelê me. Xîzmetên ku lî Kurdistanê pêk hatîne jî zordarîya cendîrme û polîsan, jî ava kirîna qereqol û qîşleyan, jî kambax kirîna, eşkence û qetliyaman pêştîr tîştî tek nîne.

Senaryoya cunta faşî menfî kirînek nû û mezîntîre jî yê sala 1925 û 1938'an. Dîvê gelê me warê bav û kalan bernede û berxwe bîde. Dîvê hemû welatparêz, dêmoqrata, sosyalîsta û pêşverûmîl bîdîna hev; lî der û hundîre welat dengê xwe bîlînd bikin, zendên xwe badîna û karekî bê westan bikin. İro jî her roj bê tîr berpîrsîyarî dîkeve ser milên me. Eger em bî xurtî dest bîdîna hev, berxwe bîdîna, dijîna nîkare daxwaza xwe pêk bine. İro dema xîret û berxwedanê ye. Dîvê hemû rê û olaxên xebatê bê cerîbandîna da ku plana dijîna bê pûç kirîna.




"Yanî dî dawîyê da we qerar da ezîzên min.."

90 Saliya Bûyina

ereb

şemo



Dı ser bûyina himdarê romana kurdi Ereb Şemo ra 90 sal derbas bû. Dı 90 saliya bûyina niviskar, zana û şoreşgerê mezın, mamosta Ereb Şemo da, em wi bı gramî (hurmet) bıbir tinn û dı vê bendê da emê hın agahdariyên lı ser jıyan, têkoşın û efrandinên mamosta Ereb Şemo pêşkêşî xwendevanan bıkın.

Zarotî û Xortaniya Ereb Şemo:
Xwendın û Xebat bı Hevra...

Himdarê romana kurdi, niviskar û şoreşgerê mezın Ereb şemo Şamilov, dı sala 1897'an da lı gundê Sûsîzê (Lı aliyê Qersê-Kurdîstana Tırkiyê) dı nav malbateke gundi da hatiye dinyayê. Wi zarotî û xortaniya xwe dı nav tunebûn û belengaziyeke gran da derbas kı. Hingê ew bıçûk bû dema neçar bû bıxebite û alikariyê bıde malê.

Erebê bıçûk xwendın û xebatê bı hevra didomine. Pıştî xwendimê ew lı ba dewlemendên ji

milletên cuda-cuda dıxebite; şıvanti û rênçberiyê dıke. Dı wê navberê da ew çend zımanên biyani -rûsi, ermeni, tırki û hurumi- hın dıbe. Zanebûna zımanan mecal da wi ku dı salên 1914 - 1916'an da lı ba kazakan wek wergervan (tercuman) bıxebite.

Dı Nav Refên Partiya Bolşevik Da

Dı sala 1916'an da, gava Ereb Şemo lı ser riya hesın dıxebite, pêwendiyên wi û Bolşevikan çê dıbe. Ji wê salê şında Ereb Şemo wek şoreşgereki-bolşevik tevi têkoşına şoreşê dıbe. Dı nav eskeran û xelkê da belavok û gaziyên partiyê belav dıke.

Çıma ku dı mitingeki da, lı pêşber eskeran gotareki dıxwine, wi dıgrın û davêjin girtixana Sarıqamişê. Paşê ku ji girtixanê tê berdan, lı ser daxwaza rêxistina bolşevik ya heremi dıçe gundê xwe û lı wır dı nav gundiyan da dest bı

karên propagandayê dike. Lê cendırme lı dü wi dıgeriyan, loma bêçare dibe û bı dızı diçe Stavropolê.

Ereb Şemo careki riya xwe ditibû; wi dı nav refên Partiya Bolşevik da ji bo rojên azad û jıyaneke mırovi şer dıkr. Jı bo serkevtına şoreşê, dı ordiya sor da û dı nav komên partizanên sor da bı camêri xebiti. Dı sala 1918'an da, wek endamê Partiya Bolşevik hat qebûlkırın.

Ereb Şemo dı sala 1920'an da çû lı Moskova-yê dı İnstitûta Lazaryan da dest bı xwendına bıınd kır û pişti xwendına du salan, lı wir xebiti heta sala 1924'an.

Ereb Şemo dı sala 1920'an da çû lı Moskova-yê dest bı xwendına bıınd kır û pişti xwendına du salan, lı wir xebiti heta sala 1924'an.

Dı sala 1924'an da E.Şemo vedıgere Ermenistanê û lı wir, wek serwêreki PK (b) ya Ermenistanê dı nav gundiye kurd da, ji bo xurtkırın û pêşdabırına siyaseta abori ya sovyeti, alikariya teşkilat û dezgehên partiyê dike. Jı bo ku karker û gundiye kurd xwe ji tesira baweriyên eşiri û feodali rızgar bıkın û bı aktivi tevi xebata çarelêkırına pırsgrêkên abori, siyasi û çandi bıbın, PK ya Ermenistanê dı gundên kurdan da seminer û konferans dıdan. Dı amadekırın û rêvebırına wan da E.Şemo bı aktivi xebiti.

Dı Bın Baskên Sosyalizmê da, Destpêka Gulvedana Zıman û çanda Kurdi û Keda Erebe Şemo

Beri şoreşa Oktobra Mezın, Rûsya gırtixana gelan bû. Bı hatına sosyalizmê, çı bıçûk çı mezın hemû gel wê bığıhiştana azadiyê, wê wek bıra bı hevra dı bın ala sor da bıjiyana. Zordestiya lı ser gel û netewan wê rabûya. Riya pêşketın û gulvedana çanda gelan wê vebûya. Bêşik kurdan ji wê para xwe bıgirtana. Û wısa ji bû. Pırderbas nebû weki xebata Partiya Komunist ji bo amadekırına kadroyên kurdi yê mıletiyê destpê kır. Bı alikariya wi dı sala 1928'an da komek cuwanên kurd şandın Leningradê ji bo ku dı İnstituya Rohilatê da bıxwinın. Dı paşerojê da gelek ji wan kesan bın zana û pısporên jêhati.

Ereb Şemo û İ. Marogulov tevayi, bı serokatiya H.A.Orbeli, dı sala 1929'an da elfabeya kurdi ya bı tipên latini hazır kırın.

Disan bı insiyativ û alikariya wi, dı sala 1931'an da xwendegeha kurdi ya Pışkavkazê ya pedagojiyê û dıbistanên partiyê ji bo amadekırına kadroyên kurdan vebûn. Jı wan xwendegehan

ronakbiriya (intelegesya) kurdan peyda bû û pêşket.

Sala 1931'an Erebe Şemo çû Leningradê û lı wir, dı İnstituya Leningradê ya Filozofi û Lingvistikê (zımanzaniyê) da wek doçent dersên zımanê kurdi da. Ew lı aliyeki kadroyên kurdi yê mıletiyê dıgihine û lı aliyê dın bı xebatên ulmi va mıjûl dıbe.

Ereb Şemo, ji bo weşandına rojnama kurdi "Riya Teze" xebateke berbıçav kır. Rojname dı sala 1930 da dest bı weşandınê kır. Her wê salê sê pırtûkên Erebe Şemo "Emrê Lenin", "Teriqa Rêvolûsiya Oktyabrê" (Tarixa Şoreşa Oktobrê) û "Kolxoz û Kara Wê Ji Gundiyan ra" hatın weşandın.

Ereb Şemo bı Qanatê Kurdo û İshak Sukerman va tevayi, ji bo tekûzkırına rêzmana (gramer) kurdi dıxebite.

Ereb Şemo bı aktivi, dı xebata konferansa kurdzaniyê (Kurdoloji) ya pêşın da beşdar dıbe. (Erivan, 1934)

EFRANDINÊN Wİ YÊN EDEBİ "ŞIVANÊ KURD" - Romana kurdi Ya Pêşın

Lı gel van xebat û xızmetên jorin, Erebe Şemo, romana kurdi ya pêşın "Şivanê Kurd" ji nıvisand. Ev roman otobiyografiya nıviskar e. Ji yana Erebe Şemo û rewşa cıvata kurd ya beri ya şoreşa Oktobra Mezın û destpêka ji yaneke azad babetên vê romanê ne. Jı aliyeki va belgekırına bûyer û guhartınên diroki ku bı serpehatiyên nıviskar ra têne pêş; yekemin car xebitandına zımanê kurdi dı edebiyata romanê da, rûmet û bıhayê vê romanê û nıviskarê wê gelekı bıınd dıpıve.

"Şivanê Kurd" cara pêşın dı sala 1935'an da lı Erivanê çap bû. Ew heta iro bı gelek zımanên dın ji (rûsi, gurci, fransi, elmani, erebi) hatiye weşandın. "Şivanê Kurd" dı sala 1978'an da lı İstenbolê bı zımanê tırki û kurdi bı hevra, dı nav weşanên Riya Azadi da gıhişte xwendevanên Kurdistana Tırkiyê.

"Şivanê Kurd" dı sala 1958'an da bı sernavê "Berbang" careke dın lı Erivanê hat weşandın.

Bılı "Şivanê Kurd", Erebe Şemo sê romanên dın ji pêşkêşı edebiyata kurdi kır: "DIMDIM" (1966), "JİYANA BEXTEWAR" (1969), "HOPO" (1969).

"DIMDIM" : Babeta vê romanê lı ser

destaneke kurdi ya kevn hatiye avakîrîm. Roman, di diroka Kurdistanê da nîmûneke mîrxasi û şervaniya gelê kurd tîne ber çavan. Piştî peymanê Qesrî-Şîrinê (1639) ku Kurdistan di navbera dewleta Safawî (Farisî) û Osmanî hate parvekirin, farîsan êriş bîrîn ser Kela Dîmdîmê, kurdan di bîr serokatîya Xanê Çengzêrî da li hember farîsan bî mîrxasi Kela Dîmdîmê parastin û heta dawiyê berxwe dan.

Ev romana diroki, ku bî şîrovekirîneke xweş û bî çanda gelê me ya dewlemend va hatiye hûnandin, dikare bibe babetê filmeke sinemayê ya tarîxî û geleki baş...

Romana "Dîmdîmê" bî zîmanê rûsî û ermenî jî derketîye. Ew di sala 1984'an da li Swêdê, di nav weşanên Roja Nû da hat weşandin.

'JİYANA BEXTEWAR' : Ev romana han jî, parçeki diroka gelê kurd ya nêzik babet digre. Reva kurdan jî ber zulma "romê" (Tirkî), ku ew çawa neçar mane jî Kurdistanê çûne Kavkazê; beşdarbûna kurdan di şoreşa Ok-

tobra Mezin da û jiyana wan ya piştî şoreşê di vê romanê da tê şîrovekirin.

"HOPO" : Romana rojên azadiyê, rojên pêşkevtin û şerfrazîyê ye. Di bîr baskên sosyalîzmê da avabûna jiyaneke nû, pêkhatin û xurtbûna kolxozan û pêşketina aboriyê, hezkirin û dilxweşiya kurdan jî bo vê jiyana teze jî romana "Hopo" rû bûne babet.

Xên jî van efrandîmên wî, bî navê "Kurdên Ermenîstanê" senaryoyeke Ereb Şemo jî heye. Wî herweha di derbarî feodalîzmê û zîmanê kurdi da jî bend û mîqale nîvisandine.

Dewleta Sovyetê qedr û bihayeki bîlind da ye xebat û xîzmetên wî bolşevîkê kevn. Nişana "Ala Sor" û nişana "Dostiya Gelan" û gelek madalyayên dîm jî Ereb Şemo ra layîq hatine dîtin.

Ereb Şemo di sala 1978'an da çû heqîya xwe. Li paş xwe xezîneyeke dewlemend jî gelê xwe ra hişt. Gelê kurd, wê wî lawê xwe yê mezin her tim bî bir bine.

□

Nalin

- Jî Apê SELÎM ra -

MEHMÛT FERHAD

Çiya harîm
Bî neyarîm
Bê xedarîm
Bê mecalîn...
Jî bo te birindarîm
Bî hawarîm
Sedem te ye em dîmalîn

Tên û dîçîm zîvîstan
Ba û baxoz
Berf û baran
Bî hesreta dîlan
Dîtîma çevan
Çev dîgerînim li hawîdorîm
Te nabinîm li serê çîya û şaxan?

Tên û dîçîm bîhar
Li welatê bîmdestan
Ax dîwelîde

Çem dîxuşîm
Erd û ezman dîkîşîm
Jî xewa giran
Dîxemîlîm banî û kulîlkên
Kurdîstan...
Destpêdîke govend û dîlan
Çev dîgerînim li nav mîlan
Te nabinîm li nav civînan?

Tên û dîçîm havîn
Hêvî û heyîna
Belengazan
Dîkelîm mîrg û deşt
Dîpîjtîqe xêr û bereket
Jî nav enîya kedkaran
Çev dîgerînim li nav xebatkaran
Li zevî û newalan
Te nabinîm li nav hevalan?
Tên û dîçîm payîz

Bî zarîm û axîn
Sîtûxwarîm dar û ber
Hîzîniye welat bî seranser
Dîbêjîm: Vaye dîsa hat
Zîvîstana har û xedar
Dîcîvîm tev hêvidar
Te nabinîm li nava kar?
Çawa derbazdîbîm sal û dem
Melûl û bî xem
Piştî te hîznîne em.
Qîr û hawara bûk û keçên me
Bî dengên xwe yê helîm
Dîbêjîm: "ma qet dîmîre
Apê Selîm..."

Nav danîm jî mîrînê ra:
Mîrîm...!
Bîla
Navê te "bêbext" bî.



MIHEMED ARIF CIZIRI ÇÛ HEQIYA XWE

Stranbêjê mezin Mihemed Arif Ciziri dı meha 12 'an da (1986) çû heqiya xwe. Ciziri 75 salî bû.

Bı mırına vi stranbêjê mezin, gelê me hostayeki muzika kurdi, hunermendeki xweyi hezkiri wında kır.

Çawa tê zanin M.A. Ciziri stranbêjeki heri bı nav û deng e li Kurdistanê. Jı heftsali heta heftê salî gelê me vi hozanê xwe nas dıke û her wısa jı rûmetê didê, jı stranê wi hez dıke. Mihemed Arif ne tenê bı dengê xwe yê xweş, ew bı hunermendi û şeweyê xwe yê taybeti jı tê nas-kırın. Bı stil, stranbêji û meqamên xwe rêçek peyda kırıbû.

Mihemed Arif Ciziri li Cizira Botan, dı nav malbateke xızan da hatiye dunya-

yê. Mihemed Arif dı gotûbêjeki da —ku girtine kasêteki û kopyeke wê dı arşiva me da heye— weha dibêje li ser jiyana xwe:

— Ez 15-16 salî bûm çûme Dihokê. Li wir ez û hevalê mı Hesên Cızrawi - ku ew bı xwe jı stranbêjeki heskiri ye -, em li gundan, li ber derê axa û muxtaran digeriyan, me digot û bı tembûra xwe abûra xwe (idara xwe) dıkir. Em pır feqir bûn. Heta me cakêt dıkırıya, şalwal dıqetiya, heta me cemedeni dıkırıya, pêlav dı lingê me da nedıma.

Me jı xelkê gudari dıkir, gotın û meqam dıdane hev û disa me jı xelkê ra digot. Mın jı pazdesaliya xwe heta iro gotiye û ezê her bêjim jı, heta ez bıkarımbım..

Jı ber mırına vi stranbêjê gelê me yê xwedirûmet û hezkiri, em jı malbata wi, dost û hezkiriyan wi ra sersaxiyê dıxwazın.

Gelê me, wê vi hunermendê mezin jı bir neke û wê dı çand û muzika xwe da bıde jiyandın.

NEWROZ

BI ŞAHİ HAT PİROZ KIRIN

A. BİRÛSK

Newrozek dın hat û çû.

Gelê me ve roja hêja dı welat da disa dı bın êrişên dijminên hov û har derbaz kır. Ew zordestên ku welatê me dı nav xwe da parçe kırine naxwazın û nahêlın ku em cejna xwe bı serbesti û bı gora dilê xwe piroz bıkın. Ew ji Newrozê dıtırsın. Ew ji agirên ser çiya û baniyan, ji kılâmên me, ji govendên me dıtırsın. Ji ber ku Newroz bûye roja azadiyê, roja hêvi û jiyanê, roja berxwedanê bo gelê Kurd.

Îsal ji Newroz lı Awrûpa Rojava, lı gelek welatan bı destê karker, xwendekar û bîrewerên Kurd hat piroz kırın. Lı Elmaniya Rojava, Fransa, Holanda, Denmark, Swêd,

Norwêç, Yewnanistan, Britanya Mezin û welatên dinê cıvinên Newrozê çêbûn. Bı hezaran Kurd, jin û mêr, cıwan û kal tevi cıvınan bûn û cejna xwe bı şahî piroz kırın.

KOMKAR'ê, isal ji lı Elmaniya Rojava û lı Fransê cıvinên Newrozê çêkırın. Lı welatên dinê ji komel û komitayên KOMKAR tevi rêxıstın û komeleyên dın cıvın çêkırın.

Dı şevên KOMKAR'ê da bı dehhezaran Kurd beşdar bûn. Dı şeva Parisê da 1500, şeva Munihê da 2500, şeva Kolnê da 5000'i zêtır, ya Hambürgê da 2000'i zêtır, şeva Berlinê da ji 2000 kes beş-

dar bû. Dı cıvınan da rewş û têkoşına gelê me bı gotın û resım (dia) ji sêrkaran ra hat nişandan. Komikên govendê, bı alikariya def û zırnê leyistıkên welat pêşkêş kırın. Şıvan, Delal, Emekçi û Seydo kılâm û stranên şoreşgeri û gelêr xwendın. Daxwazên wek "Bımre zordesti, biji azadi!" û "Azadi bo Kurdistan!" deng da. Newroz, careke dın bı şahî û bı xurti hat piroz kırın.

Hemû kesên welatparêz û şoreşger baş dızanın buhayê Newrozê bo gelê me çıye. Dızanın ku ew çêkeki hêjaye dı têkoşına gel da. Dijmin ji ji vê yekê hışyar e û ji Newrozê gelek acız dibe. Lê destê dij-



mın naghê ku welatên Ewrûpê ji pêşî li Newrozê bigre. Lê pîr mixabîm, hîn kesên ku bi navê "welatparêzî" derketine meydanê dixwazîm vi kari pêk binîm.

Ew kesên ku navê xwe danine "PKK", isal gele cehd kirin ku nehêlîm KOMKAR û rêxistinên dinê Newrozê pîroz bikin. Dî 7'ê Adarê da êrişî ser cîvîna Mûnîhê kirin, bombe avêtin û gelek kes birindar kirin. Dî rojê dawî da li Merkezê KOMKAR'ê, li komela Duisburg, Nürnberg, Hamburg da şewat derxistin, gelek zirar dan. Dî 8'ê Nîsanê da gule berdane Mehmet Elbîstan ku yek ji mesûlên KOMKAR'ê ye, xwestim wi bukujîm.

Apociyan, êrişî ser cîvîna û newrozên komele û rêxistinên din ji kirin, gelek wuqat derxistin.

Armanca Apociyan çîye û ev karên han bi kêrî kê tîn?

PKK dî kongra xwe ya dawî da biryar girtîye ku êrişî ser parti û rêxistinên dinê yê Kurdîstana Tîrkiyê bike. Endam û mesûlên PKK li her derê vê yekê eşkere dibêjin. Ew hemû parti û rêxistinên din ji xwe ra wek dijmin nîşan didin û dibêin "ji me pêve heqê kesî tune ku karê siyasî bike û Newrozê ji pîroz bike!"

Dî salên çûyî da ji Apociyan xeletiyên usa mezî kirin, hêzên welatparêz ji xwe ra wek dijmin ditîm û êrişî ser wan kirin, xwîn rijandim.

Lê ev karên han, eşkere ye ku tenê bi kêrî dijmin tî. Bi êrişê ser Newrozê, bi kuştina kesên welatparêz dijmin şadibe.

Em disa ji hêvi dikim ku Apoci xwe ji şaşî û rûreşiyên han xilas bikin, dijmin şa nekin, navê tevgera Kurdî xirab nekin û fîrsend nedîm êriş û tevdirên hêzên kevneperest. Dîvê hemû hêz û kesên welatparêz ji cardim bîfikirim, bîpîrsin: ev kirinên han bo çîne û bi kêrî kê tîn?

Lê dîvê baş bê zanîna ku bi kirinên han kes nikare pêşî li tevgera hêzên welatparêz bigre. Himber van êrişan ji gelê me ji KOMKAR'ê û Newrozê ra xwedi derket, cejna xwe bi xurtî pîroz kir.

Meseja KOMKAR-Swêd Ji Cîvîna Newrozê ra

*Ji Komîta Newrozê ra,
Hevalno,*

Isal ji cejna Newrozê li Kurdistanê dî bin êriş û zordariyên kolonyalîstan da tî prozkirin.

Îro ji gelê me li her çar parçan da li hember kolonyalîstan ji bo parastina hebûna xwe şer dîke û barxwe dîde.

Dijminên gelê me, yê ku Kurdistanê dî nav xwe da par kirine, hîn dubendi navbera wan da hebin ji, li hember gelê me piştgiriya hev dikin û dixwazîm "problema" Kurdistanê ji holê rakim.

Vi kari da yê ku zêtir ceht dîke dewleta Tîrk a faşîst e. Dewleta Tîrk dî Kurdistanê Tîrkiyê da li hember gelê me şereki yek alî didomine. Li gel vi ji, cunta faşîst êrişên xwe dîde parçeyên Kurdistanê yê din ji. Ew naxwaze ku tu perçeki da tevgera gelê me serkeve. Vi tîştî ji xwe ra numûneke pîr xirab û bi tîrs dibîne. Ji ber vê yekê ye, ku çend caran êriş bir ser Kurdistanê Iraqê. Îro ji dest ji vê daxwazê beredaye, ji bo bi dest xistina petrola Kerkûk û Mûsilê û ji ne rihetîya xwe li dijî tîkîşîna gelê Kurdî dî 4'ê Adarê (1987) da cardim bir ser Kurdistanê Iraqê.

Disa hukûmeta Tîrk a faşî bi mana "parastina darîstanan" li Kurdistanê Tîrkiyê bi hezaran

gundan bi darê zorê surgunê Enedolê dîke. Daxwaza wan ew e, ku Kurdistanê ji alî aborî û civakî va ser û bin bibe, gelê me ji welatê xwe ji zîman û çanda xwe dûrkeve.

Bi kurtayî, gelê Kurdî welatê xwe da bê heq, bê welat û bê dewlet e. Lê ew kesên, ku ji welatên wek Bulgarya, Yewnan, Afganîstan... tîn, wan kesên paşverû ra ci heye û wan dî Kurdistanê da bi ci dikin.

Gelê me naxwaze ku welatê bav û kalan berde. Gelê me vê rûreşîya han bi xurtî protesto dîke.

Hevalno,

Sedan sale, ku parçekirina welatê û pêwendiyên feodalî neyartîya hêzên welatparêz li hemberî hev tenê zirar gihandi ye gelê me û tevgera azadixwaz.

Îro wezîfa grîng ev e, ku hêzên welatparêz û şoreşger, li hember dijminê gelê Kurdî xebat û hêzên xwe bikin yek û li piştê gelê xwe bisekinin.

Valakirina Kurdistanê ra na!

Bimri Faşîzm, Feodalîzm, Emperyalîzm û Kolonyalîzm!

Biji NEWROZ!

Bibre Koletî Bujî Azadî!

Biji KOMKAR!

KOMKAR-Swêd

DÊ WELEDÊN XWE DAVÊJIN

Dicle GULÇİN

Lî welatê Kurdan, lî Kurdistanê bî rasti jî jin stranek e. Zîlm û zordari, xîzani û nezani perçeyek e jî jiyana rojane..

Bê guman gava meriv piçek welatparêz û birerwer be, her rojek û her demek jî meriv ra dibe serpehatiyeke nediti, dibe kılamek. Ku meriv bîkaribe vana bine zîman, dibîne sitran lî ser lêvên milyonan.

Ez, lî bajêrekê Kurdistanê dimam. Rojek jî rojên bîharê bû. Ax dîwelîdî. Xuşe xuşa çeman bû, ser hîldabû Gola Wanê... Faşîzm, weka awîrekê reş xwe berdabû sertanserê welat. Nale-nala girtiyên azadiyê dîhat jî zîndanên. Xîzani, betalî û nezani çar alî girtibû. Jiyan, jî keç û xortan ra, bûbû jana zîrav. Çiyayên me melûl, kullîkên me çîlmîsî bûn jî destê kevnaran. Însanên me ser nîzîm dî kar û barên xwe yê rojane da bûn. Weqa-weqa çivîkan bû. Jiyan çev berdabû hêviyê...

Ez, rêwî bûm. Jî bo karekî pêwîst bû ku ez herîme Stenbolê. Bî rasti tucar, mîn tenê rêwîti nekîribû. Jî bo vê qasê, piçek bî tîrs, piçek bî pîrs, ez siwarê otobûsê bûm. Em bî rê ketim. Otobûsa me, dî nav çiyayên Kurdistanê da berê xwe da rêya dûr û dirêj...

Vê gavê, rêwîtiya mîn çawa derbaz bû, baş nayê bîra mîn. Lewra ez jî, wek temamê dayîk û xuşkên Kurdistanê, gelek xemgîn û melûl bûm. Gelek tedarî mîn û lî temamên nasên mîn

jî hatibû kîrîn. Ne mêr, ne bav, ne bîra, ne ti û pîsmam.., û girantîr jî, ne heval û hogîr. Hinek jî wana dî binê êşkencan da, hinek jî wana bazdayibûn. Her du zarokên mîn, jî bêkesiyê stuxwar bûn. Ne şeva me şev bû, ne roja me roj bû. Gelek şevan em bî dengên zordaran şîyar dibûn. Hêja jî tîrsa van şevên tarî û zîlomat lî ser mîn û zarokên mîn neçûye. Bî kurtî dî vê rewşê da em hîsret bûn jî sîlavekê dostan ra.. Ev rewşa kambax tîm lî ber çavê mîn dîçû û dîhat. Rê jî, jî ber dûr bû, ez gelek westiya bûm, çend seet şunda ketîme xewê.

Çîqas razam, ez nîzanim. Mîn hew dît ku otobûs sekîniye. Mîn çavê xwe vekîr, ku em rex bajêreki ne. Belê ez nas nakim. Paşê şofêr gote me:

- Em vê gavê lî Îzmitê ne. Otobûs xîrab bûye, divê em qasî seeteki lî vîr bîm, heta ku otobûsa me saz bibe.

Rêwî, gişt peyabûn. Mîn lê nihêri ku lî hemberê me parçek heyê. Ez jî weka herkesî çûm lî wê rûniştim. Mîn çayek xwest. Çaya mîn hat. Hêja mîn dest bî vexwarîna çayê nekîribû, mîn dî ku jînekê, hîneki kê-m-zêde emrê wê 35-40 salî, bî destê zarokeke 3-4 salî girtîye û bî aliyê mîn va tîn. Hatîm lî kêleka mîn ser kursiyeki rûniştim. Sedem ku ez gelek jî zarokan hîz dîkim, mîn ew zarok anî ba xwe. Gava hate ba mîn jî-nîkê jî mîn ra got:

- Bila kurê min qasek li ba te bîmine, şixule-ki min heye, ezê vêga bê m.

Min jê ra got:

- Ez rêwi me, nikarim zêde li vir bîminim.

Ewê disa got:

- Ezê vê gavê bîzîvirim. Û çû...

Lî rex parqê dîkanek hebû. Min kurik bir û jê ra çiqolatek stand û em disa zîvirine ciyê xwe. Çendek derbaz bû, şofêr bangê rêwîyan kir:

- Şixulê me qediya, divê ku em bî rê bîkevîm

Ez û lawîk em rabûne ser xwe û hêdi hêdi meşîyan. Min dit ku diya wi ji dîr va xuya dîke. Me bazda bî aliyê jînikê va çûn. Em gîhiştîne balê, min jê ra got:

- Keremke, eva lawîkê te, ezê êdi herim.

Jînikê ji min ra got:

Lawîkê çî? Ev ne lawîkê min e.

Ez kenîyam û min got:

- Dev ji heneka berde. Ez rêwi me, şuxlê min lez e. Waye otobûsa min wê bî rêkeve.

Jînik li min hêrs bû:

- Tîmazê xwe bî min neke. Tu divê ku lawîkê xwe li serê min bîki bela.

Min lê nihêri ku jînik bî dil bî min ra şer dike, ez ji lê hêrs bûm. Yek ji wê, yek ji min, şerê me giran bû. Min hew dit ku jînikê gazi polêsan kir.

Polês hatin û ji wana ra got:

- Ew jînika ha, divê ku lawîkê xwe bî zorê bîde min.

Min ji, bî kurti bûyerê ji polêsan ra qise kir. Polêsan tîşkek ji me fê m nekîrin. Gotin:

- Emê we bîbine qereqolê.

Min çiqas ji wana ra hivi kir:

- Ez rêwi me, dev ji pê sîra min berdîm, ev zarok ji ne yê min e.

Belê disa ewana ji min bawer nekîrin. Û em rast birîne qereqolê. Polêsan rewşa me ji qomsêr ra gotin... Disa qîre qîra jînikê ye. Dîgîri û dibêje:

- Ev çî bû hate serê min hey Rebiyoo!

Ez ji hawar dîkîm û dibêjim:

- Rêwi me, nenas îm, dev ji pê sîra min berdîm.

Qomsêr ji tîştêk ji me fê m nekîr, belê got:

- Lî kêleka hev bîsekînim.

Me bî neyarti li hev nihêri û hatîne cem hev û sekînin.

Qomsêr ji me ra got:

- Ezê vê gavê destê lawîk berdîm. Lawîk bî aliyê ki va bê, zarok yê wê ye.

Destê lawîk berda. Lawîk hêdi-hêdi meşîya, meşîya.. Dilê min piçek xweş bû. Çawan be ne kurê min e, nayê bal min! Her çiqas min otobûsa xwe revand lê belê ev bela ha wê dev ji pê sîra min berde.

Oy! Ev çî bû? Lawîk hat-hat destê min girt û sekîni. Jî bo ku min jê ra çiqolat standîbû, disa hate cem min. Jî ber ku zarok bû, nîzani bû bûyer çî ye.

Qomsêr gelek li min hêrs bû:

- Ma ne şerm e? Ne va zarok hate cem te. Zarokê te ye. Tu fedî naki dîxi bela serê xelkê. Tu çiqas diyeke zalîm î. Min tu dê weka te bê rehîm nedîye.

Min lê nihêri ku kurik ma li ser min. Û jînik derket çû. Min ji lawîk hişt û ez ji derketim. Min hew dit ku qomsêr da pey min û dîqîre:

- Kurê xwe ji bibe. Ku tu nebi, ezê te bigîrim, li te bîdîm û te bîdîme mehkemê. Min lê nihêri rewşa min wê xîrabtîr be. Hêdîka ez vegeîriyam û min destê lawîk girt û em meşîyan. Min dit ku jînik ji nav parqêda lez lez dîmeşe. Min kurik hîmbêz kir û da pey. Ew çû ez çûm, ew çû ez çûm.. Em ketîne nav zarokên Îzmitê. Paşê jînik li ber xaniyekî sekîni. Jî berîka xwe mîfte derxîst, derî vekîr û çû hundîr. Ez ji çûm, min li zengîl xîst. Jînik derî vekîr û herwek tu tîşt dî navbeyna me da derbaz nebûye, bî dev kenî:

- Keremke were rûnê.

Ez şa bûm. Ez û lawîk çûne mal. Cih nişani me da. Em rûniştîn. Jînikê bîxêrhatîn da me. Me pîrsa hal û xatîrê hev kir. Û go:

- Tu gelek westiyayî. Ezê ji te ra çay çêkîm, gelo lawîkê te çî vedîxwe?

Ez disa şaş bûm, lawîk ji qet dengê xwe nake.

- Lawîkê min ji çay vedîxwe.

Jînik çû, ku çay çêke. Ev bûyer weka şerîteke sinemayê li ber çavên min çûn û hatîn. Xem û keserên salan ne bes bûn ev ji hate serê min. Hêdîka rabûm, dora xwe baş mêze kir. Min kurik hişt û ji nişkava xwe li derî da. Bazdam, bazdam, ha vîrda, ha wîrda ketîne nav zarokên nenas. Lez dîkîm ku jînik li pey min nekeve û rêçîka min nebîne. Ez gelek revîyam û dî nava xwîn û xweydanê da mam. Paşê ketîne ser rîya mezîn. Trafiq gelek têkîlhev bû. Bû qîre-qîra qorneyên taqîsî û kamyonan. Çî peya çî sîwar gîşt temaşa min dîkîm. Ez bî tîrs û xof hêja ji baz dîdîm. Bî vê bazdanê va serê min li kamyonê ketîne...

Gava min çavê xwe vekîr, ez dî otobûsa xwe da me. Û serê min ketîye koltuxa pêşîya min.

KARDOX



HELBESTVAN Û HUNERMENDÊ NAVDAR KOSTE XÊTEGOROV

" Ez bi berhemên wêjeyi yên Koste Xêtegorov
ra bûme nas, ew helbestvaneki zor mezın û başe..."

M. GORKI

Beri em li ser wêje û li ser lawê piroz yê gelê Ositini bisekînin, di baweriya me da, pêwiste em çend gotinan li ser dermak û cihdera vi gelê biçûk bikin.

Gelê Ositin, çawa di diroka me da hatiye, Kurd bermayên Kardoxanin, Medanin, wisa ji di mêjû (dirok) da hatiye mêlaghîrin, ku gelê Ositini bermayê Alanin, — Alan, êlek ji êlên Îraniyane — ku di dawiya babeliska sedsala nehan, destpêka sedsala dehan da dewleteke derebegi damezrandine û ola xaçperest ji xwe ra pijrandine.

Ositiya, welatê Ositiniyan di sala 1774'an da bi imperatoriya Rûsan va hatiye girêdan û ew ji wek gelên din di çarçewa vê imperatoriye da, di bin zordestiya netewî, cîwaki û çinayeti da, jina xwe bi têkoşînên dijwar derbaz kir.

WÊJEYA GELE OSITINI YA KEVN Û NÛ

Çawa gelê Kurd xudi "Memê Alan", "Mem û Zin" ê ye, wisa ji gelê Ositini xwe bi destana navdar "Alaguziyane" ya İvan Yalguzide (1775-1830) serfiraz û rûmet dibine. Rola vê destanê wek rola kevirê koşeye di wêjeya Ositini da. Lê pêwiste bê gotin ku niviskar berhema xwe bi zimanê gurci nivisibû, ji ber wê ji, destanê rola xwe hûnki dereng di literatura Ositini da list. Di vê destanê da niviskar berxwedaye ku giyanê (ruhê) netewetayîê di xûn û tamarên gelê xwe yê bîndest da berde.

Literatura Ositini bi pîr niviskar û helbestvanên hêja hatiye xemilandin. Em ji wan çendan bi nav dîkin wek: Kolliv Akso (1830 - 1866), Mamusurov Temirbolat (1843 - 1966), Kanukov İnal (1851 - 1899), Gadev Seka (1855 - 1915). Avahikarê pexşena (nesir) wêjeyi bi zimanê Ositini, helbestvanê hevdemê, helbestvanê gernas, yê ku mijara gotara meye, Koste Xêtegorov.

Piştî şoreşa Oktobê, literatura Ositini her dewlemendtir dibe. Emê navê çendan li vîr bi xwendevanan bîdîn nasin. Kubalov Aleksander (1871 - 1944), xûdi destana

folklori û romantiki "Afxardti Xasana". Sagolov Georgi (1871 - 1939) helbestvan û şoreşgerki bi nav û deng bû, cihê xwe di literatura Ositini da zor bîlnde, çirok, helbestên wi hemû li dijî setemkariyê ne, ew di berhemên xwe da ketiye bin bandora niviskarên rû. ukrani wek Niksarov, Şevçenko.

Û ji gewretirin niviskarên Ositini yên nûhjenbar Kamal Xodov e, ew roleki mezın di pêşdaçûna literatura gelê xwe de listiyê û dilize; afrandmên xwe da dostaniya gelan bi zelali diyar dîke. Ji diwanên wi "Erê xû" (1966), "Strana Ositiya Tê Bistın" (1970), ge-

lek helbestên wi tèn wergerandin û di rojname û kovarên Sovyeti da bi zimanê rûsi tèn weşandin. Û bi dehan niviskarên hêja di çarçewa Sovyetistanê da hatine nasin hene, wek Şamil Cikoiev (1940), Vaso Meliêv (1938).

Mezînbûn û gernasbûna niviskareki, hunermendeki, bi-rewerekî û hemû hozan û rewşenbirên din bi mezînbûn û pîrbûna gelê wi ve girêdayî nîne, çimki gava sîrûştê huş û aqil diyari mirov dîke, jê napirse, tu ji mîleteki gewreyî, yan ji mîleteki biçûk û nenasi; yan ji tu ji mîletê xûdi şarîstana navdari, yan tu rewend û çiyayî?

Her wisa ji sîrûştê bedew, sîrûştê dademend ev pîrsan ji Koste XÊTEGOROV nekîrin û di bin baskên xwe da bi nazdari xûdi kir, parçek ji xemil û mirovatiya xwe raberi wi kir. Koste dibe stêrkek geş li ezmana wêjeya gelê Ositîni. Ronahiya geşbûna wi sinorê Qafqasê derbas dîke, hemû gelên din ji li Rûsiya Koste wek helbestvanê xwe bi ronahiya çavên xwe di gol û girava tariyê da didîtin. Koste bûbû dengê belengazan, bilbilê azadiyê, şûrê tûj di dilê qeyseran da.

STIRANA REBEN

Lî nik xelqê hewşên fereh
hene,
Hûndrê xaniyên wan germin,
bî çirane, lihevhatine.
Lê, li cem me, zarok di
şikeftên tarida,
Jî birçibûnê, jî nêzara dîkûn
qirin.

Lî cem xelqê laşên bî goşt,
Lî baniya hûndir da libadîbin.

Le, li cem me baskên mişkên
firok,
Lî baniya hûndir da libadîbin.

Lî cem xelqê aş nikane di
salekêda,
Tovan bihêre di demê xwe da
Lê, li cem me, bes bêrek tov
hebe,
Di salêda, wê xweşjin tîm
hevalê me be.

Vaye me dit çawa zimanê rebenan, rewşa civaki bi rêz-kên şakar rêxistiyê, malên ronak û germ, malên tari û sar-tine ber çavên me. Bina goştê berx û berana di ber pozê me ra berdide, girin û qirina zîkên birçî di guhên mirovê mirovperwer dixe. Bi hunermendiya xwe raperina civaki dîke. Ji ber naverokên şoreşger di hunarên helbestvan da, ew sinorê Rûsistanê piştî damezrandina Sovyetistanê, piştî serdariya karker û cotkaran, derbas dîke û dengê xwe wek dengbêjeki dildar û xemgin dîghine gelên cihanê û bi vi rengi ew ji dikeve ferhenga lîteratura cihanê ya kevneşopî.

Ne li badil hewa niviskarê rûs yê navdar A.A.FADEYEF nivisiye: "..... Navê KOSTE helbestvanê gelê Ositîni ê biçûk ket rex mezintîrin navên civaka mirovayetiye..."

Lî Sovyetistanê ta niha 95 caran diwanên Koste hatine çapkîrî û bi 20 zimanên gelên Sovyetistanê hatine weşandin, pêwîste bê gotin, helbestvan ne tenê bi zimanê Ositîni berhemên xwe nivisîne lê hin bi zimanê rûsi ji gelek afrandîmên nerxbîha bi hunerî nigarkîrîne.

Helbestên wi li Hindê, li Çekoslafakiyayê û li hin welatên din bi zimanên biyani hatine çapkîrî. Rêxistina UNESCO ya koma netewên yekgirtî, karên Koste xistiye bernama xwe ji bo weşandî-

nê. Koste XÊTEGOROV di 15 Oktoberê sala 1859'an da li gundê "Nar" li serê çiyê ji dayika xwe bûye. Koste hin biçûk bû diya wi çû dîlovaniyê, bavê wi di desthilata Rûsistanê da cendîrme bû. Kostê zarok û cîwan di dibîstana gundê "Nar" û xwendegêha bajarê "Kubaniyê" da fêrîdibe. Hezîkirina Koste ji lîteraturê û hunerê ra li Kubaniyê destpêdîke. Li wir pîr wêjeya cihanê dixwûne, fêrî nigarkîrîna (wêneçêkirin) dibe. Di sala 1881 da li Pîtersburgê ew dikeve Akademiya Hunermendiye, lê mîxabin ew di bin barê belengaziyê da nîkane xwendina xwe kuta bike.

Lî Petersbûrgê (Leningrad) bawerîya şoreşgerî û dêmokratî di bin bandora şoreşgerên rûs da peyda dibe, li wir Koste hin bêtîr û kûrtîr lîteratura rûsî dixwûne wek Gribodva, Poşkin, Lêrmentov, Nikrasov, Krilov, Gogil û wi berhemên Şekspîr, Şîler, Gute pîr baş dîzani, lê gereke were gotin, ku berhemên dêmokratî rûs bandora xwe li Koste bi xurtî kirîne.

Di sala 1885'an da Koste vedigere "Kubaniyê", paşê diçe Ositîyê. Li wir bi çalakên hunermendî radîbe, di şanoyan da, di rojnaman da bi jîrbûn li dijî zordestiya Qeyserî radîweste, ji bo azadî û biratiya hemû gelan xebatê dîke, bi vi awayî ew dibe dengê bilind û dilsoz. Helbestên wi di bin stîranên gelêrî. Bê guman serdarên welêt nikarî çavên xwe li ser çalakên miroveki wisa şoreşger bigîrin û wi di sala 1891'an da ji navça "Tersk" sîrgûn dîkî, lê gef û gorên Qeyser alava dilê Koste venamrîne, Koste her qehremantîr dibe; ew helbestan li dû helbestan wek kaniyê dew-

lemend bî rexberi ava xwe zelal bî zewiyên da diherkine, weke dilopên ava baranê birên hejaran tiji dîke.

EZ JI MIRINÊ NATIRSIM

*Tevi gorna tari û sar bî
veşariya xwe,
Min dîkşine ber xwe,
Lê, ez ji mirinê natirsim.
Lê, ji welatê min ra,
Dilopek hêz ji dî min da hebe,
Jin, wê bî min pir bîhabe....*

*Neditiye min bextê bîha,
Lê, ez amade me serbestiya
xwe bîha,
Bikim qurban weke bextê bîha,
Eger gelê min bî qurbanên min,
Yek gav ji pêşda here.*

Diwana Koste "Iron Fandir" (Tembûra Ositini) yek ji stûnên mezin û xurte di literatura kevneşopî di cihanê da. Erê em bê tîrs wisa dîkanî bêm, çimki "Tembûra Ositini" ne tenê ji belengaz û bîndestên Ositiniyan re sazê dixê, reben û hejarên zik birçî ne tenê li Ositiya hene, lê li hemû cihanê berî şoreşa Oktobera mezin hebûn û hin ji niha li pir welatên cihanê belengaz û mîletên bîndest dîkin qirin.

Tariya, ku gelê Ositini û gelên din li Rûsistanê ditme û tîra derbaz bûne, ne ji tariya ku gelên bîndest li Afrîqa, li Rojhûlata Navîn wek gelên Kurdistan û Fîlestin taritire, nalina birçiyên Rûsistanê wek nalina bêzarên cihana sermiyandaran, ji ber vê rastiye, em bî hêsanî dîkanî bêm. Jin "Tembûra Ositini", Tembûra cihanê ye ji.

Bî rasti, eger em çiqas tîkewî nav berhemên Koste, ewqas nerxkirina me ji wira

wê bînd be û eger em çiqas berhemên wî bixûnî ewqas ji daxwaziya nasî û pênasîna wî bî mera pir û bînd dibe.

Nimûneyên, ku wêja Ositine dixemilînin pîrî. Em dixwazî naveroka destaneke wî ya navdar di vîrdarî û armanca Koste bînd ber çavan.

DESTANA FATIME

Di destana Fatime da wisa hatiye: Nayib, mireki kal bû. Laweki wî tenê hebû, navê wî Cambolat bû. Fatime qîza Mir Nayib ya ne qanûniye. Mir Nayib Fatime li malê xwe perwerde dîke. Cambolat û Fatime evindarê hev bûn. Rojê Cambolat diçe seyranê û demek dirêj venagere mal. Xelkê texmîn kir, ku ew hatiye kuştin. Mir Nayib biryar da weki Fatimê bîde mîr, bîde mîreki dewlemend. Lê Fatime nerazibûna xwe eşkere kir û gote Mir Nayib: "Ez dixwazim bî İbrahimê cotkar ra bîzewicim." İbrahim bî Fatime ra zewicî û zareki wan ji çêbû. Herdu ji ji jiyana xwe razine.

Rojê ji nişkava Cambolat ji isirê vedigere mal, dibîne ku Fatime çûye mîr. Ew diçe cem Fatime û jêra dibêje: "pêwîste tu İbrahim berdi û bî min ra heri", lê Fatime pêşneyara Cambolat qebûl nake. Cambolat ji qehra İbrahimê cotkar dikûje; Fatime ji derdê vê bûyera bêzara din û şêd dibe..

Koste di vê destana xwe yê navdar da, astenga civakî nişanê me dîke, xebata du çînan li dîji hev diyar dîke, ramana derebegan û ramana cotkaran di xuyakirî.

Destanê Koste bî vî rengî pîrî, lê ya gernastirîna destana "Fatime" ye, ev destana

pir caran bûye filîm li Sovyetistanê.

Bî rasti, gava me xwest çend helbestên Koste bî zîmanê me bî xwendevanên kovarê bînd nasî, hîlbiyartîna helbestan ji diwanên wî bî min dijwar bû, çimki min ji xwe pîrsî "ma emê çawa bêjin ev gula sor û bînxweş ji vê gula spî û bînxweş çêtîre", gulên ku di gulistanê xemlandî da di gulistanê bînxweş da û destên pêşesaziyan hatîne xwedîkirî, hemû civanî, hemû ji dîkanî singên bûkan bîxemilînin, lê her wisa ji, hêsan bû, çimki min bê tîrs çend helbestên biçûk hîlbiyartî.

BISTIRE!

*Gava ez strana te dibisim
delala min
Tevi ez dixebitim, lê nawestim
Tu tirêja roja min,
Bistire qizê! bistire.....!*

*Dijmin azadiya me dîzi...
Ta ûsti ketime nav derdan,
Ta poz ketime nav derdan,
Çiqas talin ew derd, bistire!*

*Hemû gel bî zevî xûdî dibe,
Bigri li ser min delala min!
Niha bêje min!
Çawa emê bê zevî bîjin?*

*Em bê zevîne, em naxebitî,
Fêri xebatê bike min!
Bî tenê mehê le min!
Ronahiya rojê tu yî...Bistire!*

1888

Koste bê tîrs, bî mîrani derebegan şerpeze dîke; gazi keç û xortên gelê xwe dîke, ku ew derd û nalînan xwe di singên xwe da nekûjin, dem



gelên biyani da ji wek me berê got, ciyên xwe girtine. Eger ne wisa ba, wê heykela Koste li bajarê Kirdcali li Bulgariya nehata danin !..

CÎHDERÊN BIKARANÎN

1- Kosta Xêtegorov, helbest û berhemên hûlbijarte, diwana 1, 2, 3, Moskova, 1984.

2- X.N.Ardasenov, bi kurti pêşveçûna wêja Ositini, Ordconikidze, 1959

3- Instituta Litareturi li Ositiya Şemal, Ordconikidze, 1967.

4- Nafi Cusoti, diroka wêje ya Ositini, Cilda 1, Tîblis 1980

5- Nafi Cusoti, diroka wêje ya Ositini, Cilda 1, Tîblis 1985

6- G.Z.Kaloêv, X.H.Ardasenov, D.A.Girev, nivîskarên Ositiya Şimal, Ordconikidze, 1973.

7- B.N.Tislagov, weşanên Koste Xêtegorov, Ordconikidze, 1983.

hatiye, ku bi dengên bilind bistirên, stiranên azadiyê bêjin..., çimki gava, ku stiranên serbestiyê tên bistin rûyên belengazan geş dibin, hêviyên wan bi serketimên hêja xurt dibin.

XÊTEGOROV Û WÊNE

Nivîskarê rûs A.A.Fadêof çawan Koste wek helbestvan pesnandiye, wisa ji wi nerxek bilind daye hunermendiya Koste û dibêje, ".... Koste Xêtegorov Leonard De Vinçiyê gelê Ositini ye."

Koste bi dehan û dehan wêne raberî cîvakê kirine.

Wêna ku pirtir navdare "li dibistana rûniştgeha darida li jinê", hunermend çawa di helbestên xwe da pêwendiyên cîvaki, rewşa zarên reben zarên bê dibistan, zarên nav

kevîr û latan da mezim dibin xuya dîke. (binêrîn wêne 3)

Her weha helbestvan û hunermend Koste rojnamevanekî zor gewre bû. Ewî di gelek rojname û kovaran da nivisiye wek "Kazbêk", "Şimla Qafqasê" û hwd.

Rojnamevana navdar Marieta Şaguniyan dimivise, "...Gotarên Koste rolên xwe yê diroki ta niha dilizim û bi qehremanti mirov dikane bêje, eger mirov dixwaze rewşa şimala Qafqasê di salên 1880 - 1890 da têbigine, ji gotarên Koste baştir ninim, ji bo zaniya wê demê.."

Koste wek gelek helbestvanên û navdarên cihanê jinek dirêj nedit, ew ji dest nexweşiya giran di sala 1906'an da çû dilovaniya xwe.

Berhemên Koste di xwina





ZAROK

EVDALÊ ZEYNIKÊ

AHMEDÊ MIRAZÎ



(Kerik Ji Serpêhatiya "Biraninêd Mın")

Hinekî me xeberda, paşê meta Emê got: "Ahmed, lawo ez giliyê Evdalê Zeynikê ji ji tera bıkım. Hûn ku mezın bûn, salıxa ji zarokên xwe ra bıkın.

"Ji kurê xwe ra bêjim, Evdalê Zeynikê dengbêj bû, qonax qonax ewi avite ser siyara û nexweşa, heta hatın. Baê samê axır li Evdal ji dabû, ew ji nexweşiyê nemır, lê ji ronahiya çavan bû.

Rojekê rênçber ji deştê qulingeki baskeki wi şikesti dıgırın, tinın gund. Evdal lavayi rênçberan dıke: "Ewi qulingi bıdine mın, ew ji mina mın brındar e. Bıdın ez baskê wi grêdım, belki qenc be, here bıghije hevalên xwe, mina mın heta-hetayê bıla ji hevalan şında nemine û ji refê xwe neqete."

Rênçber heyfa xwe li Evdal tinın û dibêjin: "Keremke ha ji tera apê Evdal." Evdal qulingê xwe tine, perê wi ji ciyê şikesti da grêdide, di wexteki kurt da baskê quling dıcebre; ew hini Evdal dibe û bi hevra dıbıne heval û hogır.

Bahar tê, beleki dıkevıne erdê, balınde (teyr, çıvık, legleg, quling û hwd.) yên ku ji zıvıstanên Serhedê yên sar dıçıne welatên germ û zıvıstana xwe li ciyên germ derbaz dıkın, hêdi hêdi vedıgerın tên welatê Serhedê, ji bo ku disa li deşt-zozana, wê çêrê, gul, sosın û babet babet kulilk û çiçekên rengın û delal, wısa ji saz û golên avên sar bıgerın, hêlina daynım, çuçıkan derxın û wan bı fırxın ku payızê wan ji bıdine rex xwe, disa berê xwe bıdine welatên germ.

Evdal li hêviya hatına refên qulingan bû, ji

bo ku wi soz dabû ku baskê quling qencke û disa bigihine hevalan. Evdal dıgot: - Hemın ez şûnda mame, bila qulingê mın şûnda nemine, bigihije hevalan.

Ew bêsebir hiviya hatına qulinga û dengê wan ê ziz bû.

Ew roja Evdal li hêviyê bû, ew roj hat. Bû qire-qira qulinga, hatm dı ser gund ra derbaz bûn, çûn û li mêrg û çimenên li bintara gund da danin, lê meriv kıvş dıkr, ku ji welatê dūr hatibûn, dema ku dı ser gund ra ji derbaz dibûn û dıkrine qire-qir, te dıgot qey ew dibêjm: - Selama şirin ji we ra, em disa hatine zozanên we, payizê ji dia li oxira me binın.

Wê şevê Evdal raneza, ewi dıxwest zû sibe safibe, ku ew qulingê xwe bibe bigihine refê wi, weki ku ew ji bigihije hevala. Sibe Evdal bi çend xortan va, birek ji zarokên gund ji bi wan

ra çûne çimena. Ji bo ku quling ji wan neslıkın, quling dane destê xorteki sıvık, weki bi tele-tel qulingê berde nava refê qulingan. Ji kurê xwe ra bêjm, quling li wi qulingi hatme hev û dane ber dındıka. Eger quling nefriya berbı meriva nehata wê bi dındıka ew bıkuştana.

Evdal ku pê hesiya got: - Binın binın kıvşe ewi pêşkêşi mın dıkrın, bila ew ji mın ra bımine heval.




Evdal û quling usa hini hevdu bûn, yek bê yeki temül nedıkr. Kengê Evdal dereng bıketa, nestıra quling dıkr qire-qir, deng lê dıkr, hılbet dıgot:

- Rabe bıstirê.

Evdal zef kılam avitine ser xwe. Ewi dıgot, quling ji pêra dıqirya, hılbet tewin dıda Evdal.

ZIMANÊ KURDÎ (Kitêba dersê bona dersxana IV) Ordixanê CELİL/ Erevan 1975

XAÇEPIRS





ENSAMBLA STRANÊN KURDÎ

Foto: P. Gevorgyan

Ansambla kîlamên kurdi ya nûsazkîrî bî navê "Gulan", van rojan, bî serkariya serekvanê komê yê bedewtiyê Wezirê Casım, dî mala gundê Ar-

mavirê ya Kulturê da programê dewlemend pêşkêşî bîneliyên gund kîrın. Xebatkarên gundê Armavirê û gundên ciran stranên kurdi yên

cimaetiye, pêşdaxatna dengbêja bî dîlxweşî qebûl kîrın.

Sazbend û dengbêjên komê - Etleza Qasım, Meraliyê Hemze, Sona Sargisyan, Mayıs Hakobyan, Sivoyê Hesên, Wezirê Casım û yên mayin bî hostati stranên cimaeta kurda wek: "Welat", "Mala bar kîr", "Hiv derketiye", "Baranê", "Sebra dîla", "Gulişan" û yên mayin stran.

Piştî ku konsert qediya, berpîrsiyarê wezaretê kulturê ya komarê, sazbandzan H.Xaçatûrov li endamên komê sîlav kîr, serfirazi û kêmasiyên ansambleyê dane kîvşê.

(Ji Rojnama Riya Teze
18'ê Adarê 1987)

KOMA RONAHÎ



Koma Ronahi dî sala 1983 an da, ji aliyê keç û xortên Kurd yên nehiya Araratê gundê Vediya Biçûk, dî bî serkariya Ebdûlbariyê Sîltan da hatiye damezrandin. Ev koma muzik û govendên kurdi, dî nav Komara Ermenistanê û hemû kurdên Ermenistanê da, dî demeke kurt da gelekî deng da.

Koma Ronahi dî sala 1985 an da tevi leca (musabaka) komên asambleyên musiki û govendi yên hemû Ermenistanê bûn û ciyê herî baş girtin. Ew gelek caran dî televizyon û rojnaman da derketin û dî cejna Newroza 1986'an da ji bî bernameke gelekî dewlemend va derketin û iro dî hemû şayi û dilanên kurdi da tînen dewetkîrın.

Endamên komê, derbari xebata xwe da bî kurti weha gotin: "Armanca me bî pêkainina vê komê ew e ku em kultura kurdi, stran û govendên kurdi yên dewlemend bîdîm naskîrın û pêşda bîbîn. Bona vê yekê ji em dîxebîtin ku beşdari hemû lecên navbera Komarên Sovyetistanê bîn."

Endamên Koma Ronahi ji xwendevanên Roja Nû û hemû welatparêzên Kurdistanê ra sîlavan dîşînin. Dema wana ev wênayê han dane mîn ku ez ji kovara Roja Nû ra bîşînim weha gotin: "Du hejmarên kovara Roja Nû gîhiştin destê me, em gelekî şa dîbîn ku bî zîmanê kurdi kovareke weha dewlemend û delal derdikeve. Xwesteka me ew e ku kovarê da ci bîdîne kar û barê me û hercar 1 edet Roja Nû ji me ra bê şandin. Emê gelekî dîlxweş bîn."

RODÎ
Azerbeycana Sovyetê

PIRTÛKEKE NÛ

MELA EHMEDÊ BATÊ

MEWLÛD



Cara pêşin e ku Mewlûda kurmanci ya hozanê edebiyata Kurdi, şa'irê sed sala 15'a Mele Ehmedê Batê, bî tipên latini çap dibe.

Bî vê eserê heta niha Weşanên Roja Nû sê esrên Kurdi yê kevn bî tipên latini çap kir û belav kir.

Mewlûd jî aliyê Zeynelabidin Kaya hatiye amadekirin.

DÎWANA MELAYÊ CIZIRÎ JÎ DERDIKEVE!

Disa bî amadekariya Zeynelabidin Kaya û M.Emin , diwana şa'irê nemir Melayê Ciziri wê di nav weşanên Roja Nû da bî tipên latini derkeve.

KURDISTAN

Hezar hezar sal û zeman
Hat dabirin, çiyayên me man
Hezar, hezar av û tofan
Kışyan û çûn kaniyên me man.

Hezar, hezar qebil û ber
Ser axa me saz kîrîn şer
Weke berfa singê Sipan,
Helyan, disa çiyayên me man.

Hezar, hezar car parkîrîn,
Hezar, hezar nav lêkîrîn,
Tofanê şûşt disa bîrîn,
Disa navên qedim ser man.

Hezar, hezar sedsal herîn,
Merd û namerd ser bigîrîn,
Te bernadîn em jî destan,
Welatê me xweş Kurdistan.

Rızaliyê Reşid

